


Konê Reş



Osman Sebrî

1905 – 1993

(Jînenîgarî û Çend Nivîs û Helbestên Nû)

2017

Institut kurde de Paris

INSTITUT KURDE DE PARIS

Bibliothèque

Institut kurde de Paris

Institut kurde de Paris

LIV. KL. 4989
24/11/2017
929 RES OSM

Osman Sebrî

1905 – 1993



(Jînenîgarî û çend nivîs û helbestên nû)

Konê Reş

Navê Pirtûkê: Osman Sebrî

(Jînenîgarî û çend nivîs û helbestên nû)

Navê Daner: Konê Reş

Çapa Nû: Qamişlo/ 2017

Mafê Çapê Parastiye

Institut kurde de Paris

Diyarî

Ez vê jînenîgariya Apo Osman Sebrî ya kurt
wek wefadarî, diyarî; giyanê wî, Dr. Nûreddîn
Zaza û hevalên wan dikim. Evên ku jî 60 salî ve
(Al-Partî) P.D.k.S damezirandin û jiyana xwe
tev di ber mafê gelê xwe de xerckirin.

Konê Reş

Qamişlo, 05/06/ 2017

Institut kurde de Paris

1.

Pêşgotinek Pêdivî

Mirov ji ber xwe ve nabin leheng û her roj leheng çênabin. Dibe ku di nav miletekî de, nifşek derbas bibe û Xwedê lehengekî di nav lingê dayikekê ji wî nifşî de, derbas neke.. Ew nifş stewir bimîne. Û dibe ku di nifşê miletekî de gelek dayik lehengan bînin..

Gel jî, mirovên ne leheng nake leheng. Eger teraziya dîrokê gel be, teraziya gel jî, ji zêr e. Gel bi wê teraziya xwe ya zêrîn, lehengên xwe dibijêre, navê wan di bîr û bawerîya xwe de tomar dike û bi demê re xebat û bizava wan lehengan, jêre dibe dîrok.

Ne gereke ez navên lehengên gelê kurd bêjim; ewên ku navê wan di huşê her kurdekî dilsoz û xemxur de hatiye tomar kirin, ewên ku di zindanan de, di bin şert û mercên dijwar de li ber xwe dane..

Lê wek nimûne, ez Osman Sebrî wek lehengekî ji lehengên gelê xwe dibînim û kêfxweşim ku ez vê kurtejiyana wî, wek wefadarî di 60 saliya damezirandina Al-Partî (PDKS) de ji xwendevanên zimanê kurdî re pêşkêş bikim.

Gelo! Kî bû ta ku ez wî wek lehengekî ji lehengên gelê kurd dibînim?

Osman Sebrî navekî sereke û belû ye di nav tevgera rizgarîxwaza gelê kurd de li Suriyê û di tevayî Kurdistanê de. Navê wî di tevayî Kurdistanê de wek;

têkoşerekî, torevanekî û rewşenbîrekî hatiye naskirin. Ji mafê wî û zarokên me ye ku em wî bi bîr bînin, da ku nifşên nû ji nêzîk ve wî nas bikin.

Vî lehengî bi tev şiyaneş xwe bervedêrî di ber mafê gelê Kurdistanê de kiriye... Ji destpêka xortaniya xwe ve û ta rojên dawî ji temenê xwe. Anku di 88 buharên xwe de, bi vîneke ku nayê tewandin li ber xwe daye û ranewestiya ye..

Ew jî li ser vê rêbazê, gelek caran ji rex dagirkerên Kurdistanê ve hatiye girtin û sirgûnkirin û tev jiyana xwe di mişextî û zîvariyan de derbas kiriye.

Wek dîdevanekî bû ji şoreşa Şêx Seîdê Pîran re. Di vê şoreşê de, dû apên wî bi tewana beşdarbûna şoreşê li Amedê hatine bidarvekirin. Ew jî bi gunehê şoreşê dû caran hatiye girtin û zindankirin... Di sala 1930'î de, piştî ku binxetî Sûriyê bûye, xwe li mîrekên hoza Berazan girtiye û bûye endamek ji endamên komela Xoybûnê û wiha beşdarî di şoreşa Agrî de kiriye. Piştî herifandina şoreşa Araratê berê xwe daye Kurdistana Başûr ku navbera Barzaniyan û Berzenciyan xweş bike, lê mixabin li wir jî, tev hewildanên wî beravêtî derketine.. Di navbera salên 1926'an û 1971'ê de, anku di navbera (45) salan de (18) caran hatiye girtin û zindankirin. Ew girtin di navbera rojan, mehan û salan de bûn.

Yekemîn car di sala 1926'an de li Amedê hatiye girtin û cezê xwe di zindana Denzî de derbaskiriye ta bihara 1928'an. Di payêza 1928'an de careke din, di gel 26 axayên kurdan bi gunehê ku karê xwe û

şoreşekê dikin, hatiye girtin.. Piştî 7 heyvan ji zindana Meletya hatiye berdan.. Li Îraqê jî dû caran hatiye girtin, carekê ji zindana Mûsilê reviya ye, cara din karbidestên Îngilîzan ew spartine hikûmeta Fransî ya ku sûriya dagirkiribû, wan jî ew xistine bin rûniştina zorê de li Şamê, wek tevayî endamên komela Xoybûnê..

Di sala 1935'an de dû caran li Libnanê hatiye girtin û di eynê salê de ew sirgûnî girava Madegeskar, li Afrîqiya kirine û salekê lê maye ..

Li Sûriyê 12 caran hatiye girtin, cara paşîn sal û nîvekê di zindana Kelehê de li Şamê razaye, piştî ku vê carê ji zindanê hatiye der, di sala 1971'ê de, êdî ji nû li mala xwe a li Şamê rûniştîye, xwe dûrî karê siyasî kiriyê û dest bi fêrbûna zimanê Kurdî kiriyê û ewe yê ku gotiye:

Xwe danînim ber sîtem û zorê
Divê serbilind ez biçim gorê
Gava bi rûmet biçim goristan
Hêjaye bibim lawê Kurdistan.


Konê Reş

Qamişlo, Gulana 2017

Institut kurde de Paris

Lehengêk Ji Welatê Min

Osman Sebrî



Di destpêka çerxê bîstan de, hoza (Mirdêsan) bi serokatiya Sebrî Axa di nav quntarên çiyayê (Bêlî: Nemrûd) de, ji sedê salan ve dijîya.

Ew çiyayê ku dikeve navbera bajarên Malatiya, Orfa, Siwêrek û Adîyemanê de; gundê (Narincê û Xêstûrê) ji vê hozê re wek paytextekê dihatin naskirin, çiko cihê rûniştina axayê wan Sebrî Axa

bû.. Ev her dû gund jî girêdayî bi qeza (Kextê) bûn, ji wîlayetên Adîyemanê...

Di roja 05/01/1905'an de, Xwedê kurek da Sebrî Axa li gundê wî Narincê, navê wî kire (Osman). Di nav salan de Osman mezin bû, temenê wî bû 10-11 salî bavê wî Sebrî Axa çû ber dilovaniya Xwedê, vêca li şûna bavê wî, Apê wî yê mezin (Şikrî) bi kar û barên hoza Mirdêsan ve rabû û bi dilovaniyeke mezin (Osman) xwedî kir, hem jî rêzanên hoza Mirdêsan şanî wî dan û wiha bi gelek dan û standinên navçeyê re serwest kir, da ku çavê wî vebin û amade be ji pêşerojan re.

Di wê navê re Osman Sebrî xwendina xwe ya seretayî li ber destê Mamoste (Îsmâîl Efendî), di dibistanên Tirkan de bi dawî aniye û pêre-pêre jî hez pirtûkên dîrokî û helbestan kiriye.. Belê dûrî dibistanê çûye û li kêleka mamê xwe Şikrî bi kar û barê hozê ve rabûye.

Ji ber ku yekî bi tenê bû ji bavê xwe, Apê wî Şikrî Axa xwest wî bi jin bike – li gor rêzanên Kurdan – da ku zarok jê re çêbibin.. Di 16 saliya wî de, Apê wî jinek jêre aniye û wiha ji xwendinê dûr ketiye.. Ji wê jinê Xwedê sê kur dane Osman, dudo zû mirin, yê sisîyan (Welato) di destpêka sala 1970'an de li welat (Kurdistana Bakur) hatiye kuştin, temenê wî 47 sal bû.

Osman Sebrî, di 18 saliya xwe de, hêj bêtir ji Apê xwe Şikrî hîn û serwestî rêk û rêzanên hozê bûye. Qencî û şaşiyên wê ji hev derxistine.. û pêre jî

xwestiye ku dûrî hozê bikeve, here bajarekî din danişte û xwendina xwe bibe serî.. Lê Apê wî Şikrî, rêya derketina derve ji ber girtiye û ew li kêleka xwe hiştiye da ku jê re pişt be.

Çend salekî Osman Sebrî li kêleka Apê xwe Şikrî axa bi kar û barên hoza Mirdêsan ve rabûye, ta şoreşa Şêx Seîdê Pîran destpêkiriye. Di wê hingê de wan jî xwestiye di hawara şoreşê de herin û soz û peymanên xwe bi Şêx Seîd re bibin serî. Lê sed heyf û mixabin şoreş zû beravêtî bûye.. Şêx Seîd û 47 hevalên wî di havîna 1925'an de li Amedê (Diyarbakir), hatine bi darvekirin.. Di pey re hikûmeta Kemalî berê xwe daye Şêx, Axa, Beg û Rewşenbîrên Kurdan, nemaze yên ku hilma welatparêziyê ji wan fûryaya, ew girtine û şandine dadgeha Istiklalê li (Xarbêtê).

Di wê hingê de Şikrî Axa, apê Osman Sebrî wek welatparêzekî Kurd ji girtinê bê par nemaye, deshilata Kemalî ew jî girtine û 15 salan ceze dane wî.. Di wê navê re Osman Sebrî ji Xalê xwe Hecî Derwêş sehkiyê ku wê Apê wî di filan rojê de bibine zindana Antalyayê, li ser vê yekê Osman Sebrî bi çend peyayan ve li bajarê Ruhayê ketine pêşiya karwanê girtiyan û leşkerê Tirkan de û Apê xwe Şikrî ji nav destê wan rizgar kiriye.

Vêca ji neçarî, ew û Apê xwe Şikrî bi çend hevalan re bi serê çiyayên Bêllî (Nemrûd) ketine. Hem ku xwe ji destê Tirkan biparêzin, hem jî ku karibin bi

serhildanekê rabin.. Lê mixabin wek ku wan dixwest bi wan re neçûye serî, ji ber ku kesî ji hozên herême pişta wan negirtiye, dawî ew di gel her du Apên xwe Şikrî û Nûrî û 16 hevalên wan yê din hatine girtin. Di roja 24/06/1926'an de, Kemalîstan herdu Apên wî li Amedê (Diyarbakir)ê bidarvekirine, lê ew di zindana Amed û Denizliyê de maye, ta gulana 1928'ê ji nû hatiye berdan.

Piştî ku ji zindanê serbest bûye û çend heyvek di wê navê re derbas bûne, careke din Osman Sebrî, di gel 26 serok-hoz û Axayên Kurda hatiyê girtin, bi gunehê ku xwe amade dikin ji şoreşekê re. Û bi vê tewanbariyê, li Maletyayê ew pêşkêşî dadgeha leşkerî kirine û wiha Osman Sebrî careke din dor 7 heyvan di zindanê de razaye.

Piştî ku vê carê ji zindanê serbest bûye, mêze kiriye ku mana wî li tirkîyê di metirsiyê deye û tirkîyê tev bûye zindan, vêca ji neçarî di roja 24/12/1929'an de, ji Tirkîyê - Serxetê -derketiye û berê xwe daye Sûriyê -Binyaxetê, xwe li bajarê Kobanê (Eyn Elerebê), li hoza Berazan, bi seroketiya Mistefa Şahîn Beg û Bozan Şahîn Beg girtiye. Ewên ku hîmdar û endamên komela (Xoybûnê) bûn. Ew komela ku di sala 1927'an de ji rex kurd û ermenan ve li Libnanê hatibû damezirandin.

Têkoşîna Osman Sebrî li Rojava di Nav Salên 1929 – 1951'an de

Li Sûriyê, Osman Sebrî, li ser destê Mîr Celadet Bedirxan dibe endamek ji endamên komela (Xoybûnê). Ew komela ku di sala 1927'an de li Beyrûtê, ji rex welatparêz û rewşenbîrên Kurdan ve hatibû damezirandin bi alîkariya Ermeniyan. Di vî warî de sehkin bê Osman Sebrî çî dibêje:

(... Piştî hatina Sûriyê bi sê çar heftiyên Celadet Bedirxan hatibû Kaniya Ereban (Kobanê/ Eyn Elereb), piştî em rûbarî hev bûn li ser destê wî ez bûm endamê partiya Xoybûnê...) "1".



Di sala 1930'î de, endamên komela Xoybûnê, xwe ji alîkariya şoreşa Agirî re amade kirin. Ew şoreşa ku li ser çiyayê Agirî (Araratê) vêketibû, pîlan danîn ku ji sînore Sûriyê ve êrîşî Tirkan bikin da ku akam û bandora êrîşên artêşa Tirkan ji ser leşkerên Araratê hinekî sivik bibe. Ê ya din ku bajarên li ber sînore Sûriyê re ne ji dest Tirkan rizgar bikin.

Li gor van pîlan û daxwazan, pênc eniyên şer hatibûn bi nav kirin; yek ji wan li Kobanê/ Eyn Elerebê bû, di bin serokatiya Mistefa û Bozan Şahîn serokên hoza Berazan û digel wan Osman Sebrî. Belê li gor pîlanên şer û serketinê pêwîst bû ku Kurdên bakur jî, bi vî kar û barî agahdar û serwest bin.. Vêca komela Xoybûnê Osman Sebrî durist dîtin ji bo çûna bakurî Kurdistanê da ku Kurdan agahdar û serwestî şoreşê bike.

Wiha Osman Sebrî di serê buhara 1930'î de derbasî bakurî Kurdistanê bû û gelek name û belavokên Xoybûnê li serokhoz û Axayên Kurdan belav kirin û nêzîka du heyvan lê wir maye û ji nû zîviriye Sûriyê.

Belê piştî ku zîviriye Sûriyê, hikûmeta Kemalî ji hikûmeta Fransî ya ku di Sûriyê de desthilat bû doza xwestina wî kirine; lê Fransiyani ji bo berjewendî û armancên xwe yê eşkere û veşartî, nedixwistin ku Osman Sebrî bispêrin Tirkan.. Vêca ew ji Kobanê sirgûnî bajarê (Rezza) kirin, da ku dûrî sînore tirkîyê be.

Piştî ku dor heyvekê ji sirgûniya wî li bajarê Reqqayê, Bozanê Şahîn Beg şandiye pey, ji bo xatirê

biryara komela Xoybûnê di her pênc eniyên şer de beşdar bibin û ji aliyê xwe ve agirê şoreşê vêxînin.

Û wiha di roja 01/07/1930'an de şeva yek li ser diduyan Osman Sebrî di gel 20 neferên hoza Berazan sînorê tirkîyê derbas kirine û du qereqolên Tirkan li qeza Siwêrekê kirine bin destê xwe de û divîbûn hîn pêşde herin, lê wek ku xwestine bi wan re neçûye serî, ji ber ku di eynî demê de sehkirine ku her du serokhoza Berazan Mustefa û Bozan ji rex hikûmeta Fransî ve hatine girtin.

Bi nûçeya vê girtinê re neferên ku bi Osman Sebrî re bûn tev bi paş de vegeriyên Sûriyê û Osman Sebrî bi tena xwe maye.. Ew jî piştî çendakî, zîvirîye Sûriyê.. Lê bê ku xwe bide dest hikûmeta Fransî. Ji tirsê ku wî jî, wek, piraniya serokhoz û welatperwerên Kurdan, bixin bin darê rûniştina zorê de li bajarê Şamê, vêca ji neçarî xwe li bal Şêx Michem kurê Hadî "2" serokê hoza Erebên Iniza girtiye û dor du heyvan di mêvandariya wî de maye.. Ji wir xwe li Iraqê girtiye, pêlakê baş di mêvandariya Şêx Ehmedê Barzanî de maye.. Derbarî vê qûnaxê Osman Sebrî wiha dibêje:

(Di sala 1930an de, li Barzan min û rehmetî Şêx Ebdilrehmanê Garisî hev nas kiribû û serekî dirêj bi rehmetî re bibûm heval...) "3".

Li vegera ji Iraqê, ew li Mûsilê ji rex hikûmeta Ingilîzî ve hatiye girtin û bi rewşeke xerab û perîşan xwe ji nav lepên wan Ingilîzan rizgar dike, bi rev vedigere Sûriyê û careke din xwe li bajarê Tilebyedê,

li Erebên Iniza digre û li cem wan dimîne. Piştî demekê, ew jî xwe li welatparêz û ronakbîrên Kurdan digre, ewên ku li Şamê di bin rûniştina zorê de bûn wek: Mîr Celadet Bedrixan, Memdûh Selîm Wablî, Qedrî Can, Haco û zawên wî, Mustefa Beg û Bozan Beg Şahîn serokên hoza Berazan, kurên Cemîl Paşa Diyarbekirî; Ekrem û Qedrî û Qasim.. Qedrî Can, Hemze Begê Miksî, Dr. Ehmed Nafiz Beg Zaza û birayê wî Dr. Nûreddîn Zaza û gelekên din ji endamên komela Xoybûnê.





Di wê hingê de ji nû Osman Sebrî ji nêzîk ve bi van welatperweran re li Şamê rûniştîye û bîr û baweriyên wan nas kiriye.

Di serê buhara sala 1931'ê de, komela Xoybûnê ew rêkirine bal Şêx Ehmedê Barzanî, ji bo xatirê navbera wî û Şêx Mehmûdê Hefîd xweş bike.. Di wê mêvandariyê de Xwedê kurek daye Şêx Ehmedê Barzanî navê wî kiriye (Osman), li ser navê Osman Sebrî.

Di vê çûna wî li Îraqê de, Osman Sebrî /165/ rojan li Kurdistanê dîm kiriye, ta ku li Hewlêrê ji rex Îngilîzan ve hatiye girtin û pêlakê di zindana Hewlêr û Mûsilê de maye.. Vê paşiyê Îngilîzan ew teslîmî hikûmeta Fransî a ku li sûriyê desthilat bû kirine.. Wiha careke din vegeryaye Şamê, nav hevalên rêya Kurdayetiyê.

Li Şamê, gelek caran ew û hevalên xwe li ser babet
û problemên netewî û şoreşgerî, ketine gengeşiyên
gerim de.. Di encamên wan qerebalix û germbûna
wan gengeşeyan de, ew û hevalên xwe dûrî hev
ketine.. Lê çendî ji wan dûr ketiye jî, careke din li
wan vegeriya ye.. Ta ku Mîr Celadet Bedirxan di roja
15/05/1932'an de kovara xwe (HAWAR)ê li Şamê
çap kir û di nav Kurdan de belav kir.

Di hejmara pêşîn de ji HAWAR ê, rehmetî Qedrî
Can nivîsek di bin navê (Hawar hebe gazî li dûye)
belav kir û têde wiha dibêje:

(Ji bo birayê min Osman Sebrî)

Jiyîn çiqas delal e
Di nêv bav û biran de
Dil heye ko ne nale
Ber birînên rîman da

Ev birîna rîman e,
Barekî pir giran e,
Kezeb, gurçik ne mane,
Li pepûkên xwehan da.

Hawara me vaya ye
Xewa bê kêr bela ye
Qet şik têde ne ma ye
Di gotinên yaran da.

Belê Osman Sebrî jî nemerdfî nekir, wî jî helbestek
wek bersivê ji Qedrî Can re nivîsand û di bin navê

(Berdêlik; Ji Qerdî Canê Canbira re) di hejmara 2'an
de ji kovara Hawarê belav kir:

Jiyîn xweşe bi xurtî
Li Kurdistan bi Kurdan
Bav û biran; çi bikim?
Hemû min tê bi dirdan.

Min dil tu car ne nalî
Min zar tu car ne kalî
Bi dil hişkî, bi lalî
Sînga xwe da ber rîmanî

Min îşev dît xewna rast
Deng û gazî çi xweş hat
Digot rabin Kurdino!
Tev biran û tev xwehan.

De rabin li me tu zanî
Rim nîne giş nîzanî
Xopan kirin Kurdanî
Ev teral û nezanan

Hawarê, xweş awakir
Dilê Kurdan pê şakir
Zar û zîman ava kir
Jîn û xweşî belav kir.

Kaniya Ereban, 18/5/1932

Ji wê hingê ve Osman Sebrî dest bi nivîsandinê kiriye. Mirov dikare bibêje ku kar û barên Osman Sebrî yên bi xurt û berfireh, doza wî ya her dem û kêlîkê vêxistina agirê şoreşa çekdarî bû.. Lê ji wê roja ku bersiva Qedrî Can vegerandiye, rahiştiye pênûsê û nema ji destê xwe berdaye.. Û wiha di bin akam, navtêdan û bandora Mîr Celadet Bedirxan de, pênûsê bi hiloyî tîfing ji milê wî aniye xwarê û ew di şûn de rûniştiye û wiha ta roja dawîn ji temenê wî.. Derbarî vê yekê, Apo Osman Sebrî di kovara Hêvî de, hejmara 7'an sala 1990'an, wiha li Firat Cewerî vedigerîne:

(Ev ji bextê me yê reş e. Bav û kalên me gunehkariyeke mezin kirine ku bi zimanê xwe mijûl nebûne. Di welatê me de Ermenî hebûn, Sûryanî hebûn, hindik bûn, lê wan bi zimanê xwe dixwendin. Me diçû bi zimanê Tirkî û Ereban dixwend. Ev hemî sûcê bav û kalên me ne, em hîn nekiribûn. Heye ku rehmetî Celadet nebiwa, dibû ku me bi xwe jî guh nedabiwa vî karê ha. Ji ber ku em ne xwediyê vê fikrê bûn, ev fikir ji wî derket, mala wî hezar carî ava..)

Û di serdanekê de jî wiha ji min re got:

(Ya rast ewe ku rehmetî Celadet Beg berê me da nivîsîna bi zimanê Kurdî...) "4".

Belê, tevî ku dest bi nivîsandinê kir û hewl da ku hêza xwe têxe xizmeta qada ziman û rewşebîriya Kurdî de, lê her hestê wî yê şoreşger zoriya ramanên wî dibir û mêla wî bi ser şerê çekdarî ve dima..

Her divîbû ku tişteki bi hêza tifingê bêk bîne. Lê hewldanên wî bi ba re diçûn.. Ji ber ku ew û hevalên xwe li Şamê di bin darê rûniştina zorê de bûn, nikarîbûn ji ber hikûmeta Fransî ji Şamê billivana. Hikûmeta Fransî sozên giran dabûn hikûmeta Kemalî a ku ji endamên Xoybûnê bi tirs û saw bû; ku endamên Xoybûnê di bin çavnerîna hikûmeta Fransî de bin..

Ji nav tevan Osman Sebrî neditebitî, rûnedinişt digot: (Wilo rûniştî nabe, divê em çareyekê ji bo rizgarkirina welat bibînin...) Wek van gotinên wî, li hawê hikûmeta Fransî nedihatîn. Vêca çend carekî hikûmeta Fransî zirt û fort lê dikirin û dawî ew surgûnî Cidde û Arîtêriyayê kirin.. Hingê Osman Sebrî ev helbesta bi navê (WELAT), di bin navê xwe (Axayê Mirdêsî) de, nivîsand û di kovara HAWAR ê hejmara 19'ê de belav kir:

Ew çiyayên bilind, avên disar, parîzên rengîn.
Ew deştên birez, gundên bipez, bajarên zengîn;
Ew lawên delal, xortên şepal, hingên kurê Zal;
Ew bedewên çak, delalîyên pak zeriyan narîn.
Çar bûn? kûde çûne? li kû mane? ha bêje...
Ev derdê bêderman ku wa ez kirime dîn,
Evînek dilsoj, te êxiste hinavê min
Bi pêta vê arî tim û tim digrîn Mem û Zîn.
Di rêya felat te de, ger çiqas bi westim
Pê kêfxweş dibim, bilahî ez nabim xemgîn
Ez minetê negrim ji bona mayîna Sûriyê
Hê vir jî nebit eve di rex min de Felestîn

Bîstek nikarim te bi derxim ji bîra xwe
Dixwazin bila min bişînin nav Çîn û Maçîn
Dema ko nakaribim li erdê Sûriyê biaxivim
Min destê xwe daye birayê xwe yê Cegerxwîn. "5"

Cegerxwîn jî wek bersiv ji bo Osman Sebrî, ev helbesta xwarê bi navê (Peyamek Cegerxwîn: Ji Osman Sebrî Efendî re) nivîsand û di kovara Hawarê hejmara 21'ê sala 1933'an belav kir:

Bigorî bim ji bo te ey birayê min tu kanî
Ji dûrî ve te destê xwe di nîv destê min danî
Bi min û te du destên bê çep û rast ey birader
Belê herdu qewî jarin di yek laşê giranî
Me pirsî derdê Kurdmançan ji çerxa etlesa jor
Nezanî bo tevan derde belê lê me xizanî
Belê zêre belê zêre belê zêre belê zêre
Xwedanê wî cîhangêre bela ker bit dixanî
Ji bo me ne eqil fêde dikî ne xwendina pir
Ji bo me çû divêtin da ji tirsan bidne banî
Feke va ye mirim îro ji dinya ez hilat im
Bi gera xwe bi çerxa xwe te daxwaza me nanî
Cegerxwîn im mirim ez çûm ji bo we Sebriyek ma
Erê himberî Kurde welê bê wehya esmanî.

Cegerxwîn

Dawî Fransîzan di buhara 1933'an de, Osman Sebrî di rêka bendera Ciddayê re sirgûnî Şerq Elurdun, Felestîn û Arîtêriyayê kirin.

Li Ciddayê wî ev nivîsa bi navê: (Ji dûr ve: Ji Nûrê Min ê delal Mihemed Beg re), nivîsand û di kovara Hawarê hejmar 21 sala 1933'an belav kir:

(Kula min a kambax dîsan serî hilda. Dostinon nexweş im ez. Wek agirê Zerdeşt giş bûme pêt. Yarînon dilateş im ez. Ne kaş dibêjim, ne çiya, ne deşt ne newal. Serqot û pêxwas diçim, ber bi armancê, bo gihanê dimeşim ez.

Nizanim, ji hev nayînim der. Çi rêke ecêb e? Rojkê dibim Ristim; dilhişt, kezebhesîn im, qey qelsm ez.. Roja dotirê Dodikê qulingvan. Wek dîlên di ber destê tırko bextreş im ez. Rojin hene, di nav hevalan de spehî û çeleng im, ji wan re Yûsif im ez. Lê hew te dî sibe tir, ew çend dibim sik qey Hebeş im ez. Suc bibe kurkê kûzîn, ma kes li xwe dike? Min milên xwe di wî ra jî kiriyê, rûreş im ez.

Geh sofî me, geh gebr û tersa, carînan dibim Durzî. Di civat û li ber masan da demkeş im ez.

Her çend ne î jêhatî me, lê di roja gihana bedewê de şûrkêş im ez. Ev demdemî tev ji bêxwedîtî, ger min xwedîkî zana hebe her gav duşêş im ez. Her çî ko dil heye, bibe dîn û eware, bila bête nik min, heya roja glhanê pê ra dimeşim ez. Li ber vê defa bêşivik, tembûra pirdebelav, guhikşikestî, bîstekê dienirim, bîsta dîn kêfxweş im ez).

Osman Sebrî/ Cide: 1933

Li Arîtêriya bajarê Mesûh, pir bêriya welat dike, roj li ber çavên wî reş dibin, bîna wî teng dibe, dilê wî wek pêlên deraya sor lê dide.. Ew jî ji Xwedê dixwaze ku bibe teyrek, bifre û xwe li welatê xwe Kurdistanê deyne.. Sehkîn bê wî di wê xerîbiyê de, di gotarê bi navê (Li Gornistanek Amedê) çî gotiye: (... Min da xwe û rabûm- Navbera mala me û behrê du sed gav hebûn- Ber ve behrê çûm (Her car ko ev kela li min radibûn ez diçûm ber behrê. Ji ber ku derdên min û wê bi hev diman ko timî bi pele..)..
Hêdî hêdî diçûm gumîna pêlên behrê.. Wê gavê min fira teyran dixwazand... Difiriyam... Ciyê ez bi çûmayê nêzing bû, di bêhnê de Felestîn, Şerq Elurdun, Sûriye derbas kir û li tala Serê Kaniyê li sînorê welêt raperîm. Di navbera Mêrdîn û Wêranşehrê re min xwe gîhande ser Diyarbekirê...) "6".

Pîştî ku ji Mesûh (Afrîqya) vegeriyaye Sûriyê, pêlekê li bajarê Hemayê "7", li nav Berazîyan rûniştiye û ji wir digel kurên Şahîn Begê Berazî, çûye Libnanê.. Li Libnanê du caran, ji rex hikûmeta Fransî ve hatiye girtin.. Dema ku di havîna 1935'an de ji Libnanê zîvirîye Sûriyê, hikûmeta Fransî a ku li Sûriyê bû careke din dest danîne ser û ew sirgûnî Afrîqayê, girava (Medegesker) bajarê (Sent Marî) kirine.. Û wiha lê maye ta bi havîna 1936'an.

Di wê sirgûniyê de helbestek li ser hal û perîşaniya xwe nivîsandiye, tê de gotiye:

Hê warê ko biyan bû
Yanzde salan ji bo min
Ne hezkirina delalan
Ne serdilk ne yar û jin
Ew pêl ji emrê şêrîn
Borî di deryaya xem
Tev diltengî zîvarî
Bi dijwarî û elem
Wek rêwiyê pir westî
Bê zar bû bûm ji jînê
Kê bîr dibir binêre
Li deftera evînê
Me got qey derd û kulan
Arê di dil temirand
Çira bihara jînê
Bi zorbakî vemirand
Ne diyar bû ew rê ji min
Ma bûm di kuncê tari
Tim bilêkek bîrekuj
Bi ser dil da dibarî
Kurmê wî nav evîn bû
Di bistanê ciwanî
Bi derd û kul û hesret
Ket xew serê xwe danî
Bihar holê kuta kir
Çû dawiya havînê
Hişyar ne bû bi carek
Bê hêvî bû ji jînê
Îsal ko her du paiz

Gîhane hev bi reşî
Me dît kapa bextê me
Dumîr hatin bi xweşî
Di parêzên welatî
Me dît ji bo xwe sorgul
Weke Memê Cegerxwîn
Ji bo wê bûme bilbil
Demîkî ez vehistim
Di sîdara gula sor
Bûm pinpinî û venişt
Li ser tîlan dor bi dor
Derdên ko yanzde salan
Me bê awa civandin
Wê xweşdema li nik wê
Hemî ji me revandin
Erdê ko wê tê geşte
Bo min dêra miqedes
Hêjayî Hind û Çîn e
Di rex wê de yek nefes
Leyla çî şermisar e
Li pêşberê delalê
Zîn hingî pesindar e
Bo periya cemalê
Me pesna wê ne qesd e
Nîne şêrînzîmanî
Ew rewşa şeng û oflaz
Çavmat dihêle Xanî
Heke Feqî bidîta
Dê dest li ber bibesta

Melê bi sed kul û derd
Wê lêva xwe bigesta
Ew jî ji bo me pir dît
Felekê kir neyarî
Rahîşt milê me avêt
Nav girava Sent-Marî
Lê sed girîn û hisret
Bilbil wê dem û gavê
Ne dît ji bo xwe birbang
Dîmek negîhand xunavê
Hê pirpirokê sermest
Çavên belek tu kuştin
Bigrî û xwîn birêje
Gelek dûre gêhêştin.

Medegesker- Sent- Marî, 10-2-1936
Osman Sebrî "8"

Lê min ji hev dernexist bê çima hikûmeta Fransî ew
bi tenê sirgûnî Cidayê, Mesûh û girava Medegesker
kirine..? Tevî ku pirraniya endamên komela Xoybûnê
û welatperwerên Kurdan li Şamê, di bin darê
rûniştina zorê de bûn?! Di vî warî de çêtirîn bersiv ya
wî bixwe durist dibînim, ew bersiva ku di kovara
Hêvî de li Firat Cewerî vegehandiye:

(Gava ku Celadet rehmetî dest bi derxistina Hawarê
kir, di dilê me gişkan de kerameta nivîsandinê çêbû.
Lê piştî Celadet ji min re pirsek jî gotibû, ew xweş
ketibû serê min. Got:

(Ez dibînim çavên te li çîrokên şoreş û lêxistinê ne... Em ferz bikin ku tu bi tenê bikaribî Kurdistanekê çêbikî. Lê ew Kurdistana ku merivek çêbike, merivek dikare xerab jî bike. Lê nivîsandin tu çi bikê ew dê ji millet re bimîne. Ew gotinên rehmetî di serê min de cih girtibûn û ez bi ziman mijûl bûbûm..) "9".

Xuyaye piştî vê gotina Mîr Celadet Bedirxan, Osman Sebrî pêlakê bê deng bûye, kar û xebat di nav rêzên komela Xoybûnê de kiriye û ji ramanên şer û şoreşgerîyê dûr ketiye.

Di sala 1938'an de xwe dûrî komela Xoybûnê kiriye û bi çend kesên din re komelek bi navê (Yekîtiya Xortan) li bajarê Şamê damezirandine. Vê dawiyê xwe tevlî (Nadî Selah Eldîn Elseqafî Wel Riyadî) kiriye û di sala 1942'an de navê xwe kirine (Nadî Kurdistan: Yana Kurdistan)..

Di wan salan de jî Osman Sebrî bi dehan keç û xortên kurdan li Şamê fêrî xwendin û nivîsandina zimanê Kurdî kirine. Û Di sala 1949'an de di beşdarî di avakirina (Yana Henano) de kiriye. Di sala 1954'an de (Yana Cezîrê).. û her wiha di van Kulûp û yanan de xort û keçên kurdên Şamê fêrî xwendina zimanê kurdî dikirin..

Lê ji ber êrîşên kesên Kurd yê komunîst ji rexkê ve û êrîşên Îngilîz û Fransîzan ji rexê din ve (Nadî Kurdistan), hat girtin.. Wî jî, ji neçarî xwe dûrî Şamê kir û di sala 1941'an de çû Tirkîyê. Nêzîka sê heyvan

lê maye, di eynî salê de careke din vegeyriyaye Sûriyê, li bajarê Şamê hevkarîyeke nû bi Mîr Celadet Bedirxan re daniye û bi berdewamî di her du kovarên wî de (HAWAR û RONAHI) nivîsandiye. Rûpelên van kovaran bi gotar, helbest û wergerandinên xwe xemilandine. Ranewestiya ta ku ev kovar di sala 1946'an de hatine rewstandin.

Ev hin nimûne ne ji wan nivîsînên Osman Sebrî di kovara Hawar û Ronahîyê de:

1- Dûroka jîna Napilyon / Hesên Celal /, ji zimanê Erebi wergerandiye bo zimanê Kurdî, li ser rûpelên kovara (RONAHI) di /12/ xelakan de belavbûye di hejmarên 17 - 28'an de.



2 - Tarîxa Kurd û Kurdistan / Mihemed Emîn Zekî, ji Erebi wergerandiye bo zimanê Kurdî, di (3) hejmarên (HAWAR) ê de belavbû ne, sala 1941an.

3 - Dîroka Jîna Selah Eldîn/ Dr. Ehmed Bêlî /, ji Erebi wergerandiye bo zimanê Kurdî, di (5) hejmarên (RONAHÎ) de belavbû ne, sala 1944-1945'an.

4 - Ezdî û Ola wan, di (3) an hejmarên (RONAHÎ) de belavbû ne /19-20-21/ di sala 1943'an de.

5 - Ji bîrên Rojên Kevin: Navê dîwaneke helbestên Apo Osman e, di (HAWAR) ê de belavbû ye.

6 - Di wê demê de jî, bi dehan gotar, helbest û nivîsandinên wî yên têvel di kovar û rojnameyan de belav bûne, nemaze wek ew gotarên li ser nêçîrê, çiyayên Sasûnê, Agirî, Mirdêsan, rola jinan û sincî, hwd...

7 - Çend helbestên bedew ji bo zarokan afirandine û di Hawarê belav kirine.

Hêjaye gotinê ku Apo Osman Sebrî di sala 1944'an de careke din zewicîye, xanima wî Çerkezî bû, navê wê (Şadya Receb Doxoz) bû. Xwedê sê kur û du keç dane wan, navê kuran; Hoşeng, Hoşîn û Heval e, navê keçan Hingîr û Hêvî ye. Tev li Ewrûpayê dijîn.

Lê (Kewê), gelek kesan texmîn kirine ku keça wî ye, na, ew keça birayê wî ye. Kewê, bi wefadarî piraniya buhara temenê xwe di xizmeta Apê xwe de derbas kiriye.. Piştî koçkirina apê wê, ji nû bi mamoste (Şêx Birimce) xortekî Kurdê ji Efrînê re zewicî ye.


Di sala 1946-1947'an de, piştî ku Fransî ji Sûriyê derketine û hikûmet bûye erebî, ew karê rewşenbîrî li ber Kurdan qedexe bûye, (HAWAR) û (RONAHÎ) jî hatine girtin.



Di sala 1949'an de, di heyamê desthilatdariya hukmê Husnî Zeîm de li sûriyê, Osman Sebrî hatiye girtin û biryar hatiye standin ku wî sirgûnî bajarê (Tudmir/Palmêra) bikin.. Lê di êvara wê rojê de conta Leşkerî (Derba Leşkerî) li hukmê Hisnî Zeîm rabûye û hukimê wî hatiye guhertin. Bi wê guhertinê re Osman Sebrî ji zindan û sirgûnê hatiye efûkirin û serbest bûye.

Bi vê serbestbûna wî a dawî re, mala xwe ji Şamê barkiriyê nav Kurdên Cizîrê, bajarê Derbasiyê ji bo xatirê nanê rojê û li wir bûye mamûr di Mîra de. Û

wiha, di navbera salên 1949'an ta sala 1951'an de karê mamûrtiyê li Cizîrê; bajarê Qamişlo û Derbêsiyê kiriye..



Qûnaxa 2'mîn ji xebata Apo di salên 1951- 1971'an de

Di roja 15/07/1951'an de Mîr Celadet Bedirxan li Şamê çûye ber dilovaniya Xwedê. Hingê Osman Sebrî xwestiye cihê wî li Şamê dagire. Ji ber ku wî, kes ji xwe di pisporiya rêziman û nivîsandina bi Kurdî de nedît. Vêca di derhel de, ji karê xwe yê di Mîrayê de berdaye û mala xwe ji Cizîrê bakiriye Şamê, da ku wê qûncka vala dagre û şûna mîr Celadet Bedirxan bigre.

Lê dîsa wek wî dixwest pêre neçûye serî... (Ji ber ku tu carî şagirtê bêcir, zirz û bînteng nikare cihê mamostayê xwe yê şareza, pispor û bînfirêh dagire...). Wek ku ta niha heval û hogirên wî dibêjin; Xwedê jêrazî Osman Sebrî, xwîngerim, mirovekî zirz, bînteng û bêcir bû..

Di sala 1955'an de wî û çend havalên xwe wek Rewşen Bedirxan, Dr. Nûrî Dersemî, Hemîdê Hecî Derwêş yê ku wê hingê li zanîngeha Şamê dixwend û gelek kesên din, komelek bi navê (Komela Vejîna Çanda Kurdî), damezirandin. Ji encamên wê komelê ku xelkên kurd hînî xwendin û nivîsandina bi zimanê kurdî bikin û wê komelê karîbû di navbera salên 1954 û 1956'an de, çend pirtûkên bi zimanê kurdî û yên bi zimanê erebî li dor kêşeya gelê kurd di nav kurdên Rojava de çap û belav bike wek: Dîwana Apo Osman Sebrî (Bahoz) û (Derdên me), di gel Elfabeya

wî a tekûz, hem jî pirtûka (Çend rûpel ji wêjeya kurdî) ya rehmetiya Rewşen xanim Bedirxan û di sala 1958'an de dîwana melayê Cizîrî weşandine. Di wan salan de jî bîranînên Dr. Nûrî Dêrsimî li Helebê çapkirine û di heman katê de hatiye qedexe kirin, di gel dîwana Cegerxwîn ya duwemîn, ewa ku Osman Sebrî pêşgotina wê nivîsandiye.



Belê hin bi hin endamên vê komelê ji ber hev ketine.. Bêtir ji ber ku Kurdên komunîst şerê wan dikirin.. Di vî warî de wiha bersiva nivîskar Firat

Cewerî xwediyê kovara NÛDEMÊ, di hejmara 8/1993'an vegerandiye:

(Hin ji me bûne peyayên ereban, hin bûne yên farisan û hin jî bûne yên tirkên. Dibêjin em komunist in, lê bi serê bûrjûvazî dimeşin. Ma welê dibe? Em ê bi vî awayî ci safî bikin?! Dibêjin em komunist in, lê bi zimanê xwe napeyivin, naxwazin bipeyivin. Li malên xwe, bi zarokên xwe re bi tirkî, bi erebî û bi farisî dipeyivin. Lê bi kurdî napeyivin, naxwazin.. ma komunist welê dibe..)


Di eynî salê de /1955/, Osman Sebrî di avakirina partiyekê Kurdî de ponijî ye. Da ku Kurdên Sûriyê di bin baskên wê rexistinê de karibin doza mafê xwe yê netewî û rewşenbîrî li hikumeta erebî di sûriyê bikin, mîna partiya Demokratî Kurdistanî li Iraqê.. Hem jî ku xwe ji êrişên komunîstan rizgar bikin û karibin bersiva wan komunîstan bidin..

Xuya ye ku di sala 1956'an de ramana damezirandina (Al-Partî) di mala Rewşen Bedirxan hatiye gengeşekirin.. Wê hingê jî mamoste Celal Talebanî û Dr. Nûreddîn Zaza li Şamê bûn, wan jî alîkarî bi wan re kirine.. Nemaze Dr. Nûreddîn Zaza yê ku ew rêzana Osman Sebrî ji Al-Partî re danîbû gelek guhertin têde kirin..

Û wiha di roja 14/06/1957'an de Partiya Demokratî Kurdî li Sûriyê (Al-Partî), di bin serokatiya Osman Sebrî û hevalên wî Abdul Hemîd Derwêş, Hemze Newêran, Reşîd Hemo, Şêx Mihemed Îssa, Şewket

Henan, Mihemed Elî Xoce û Xelîl Mihemed hat damezirandin.

Partiya Demokratî Kurdî li Sûriyê (Al-Partî), di sala 1960'î de, rojnameya Dengê Kurd bi kurdiya Latînî weşand.



Li gor ku min ji mamoste Abdul Hemîd Derwêş pirsî, wî got:

(Di serê sala 1960'î de me (Dengê Kurd) bi kurdiya latînî diweşand.. tê bêra min; Dr. Nûreddîn Zaza gotarekî (Maw Tîsî Tong), ji Fransî wergerandibû kurdî bi navê (Serberdayetî) têde belav kiribû..)

Li gor ku ji min re got, ev rojname (Dengê Kurd), ji rex komîta navendî a (P.D.K.S) di navbera salên 1960 û 1964'an de derketiye, û ji kesên ku têde

dinivîsandin ev bûn; Osman Sebrî, Dr. Nûreddîn Zaza, Reşîd Hemo, Cegerxwîn û Hemîdê Derwêş..

Bi damezirandina Al-Partî (P.D.K.S) re, di nav Kurdên Sûriyê de, şiyarbûn û zanînê serê xwe rakirin, Kurdan doza mafên xwe yê netewî û rewşenbîrî kirin.. Lê ew daxwaz û armancên ku Kurdan dixwestin li gor hawê hikûmetên Erebi li Sûriyê nedihatîn, vêca dest bi şerê Kurdan kirin, nemaze ew kesên ku Al-Partî damezirandinbûn û yên ku endamên wê bûn. Hikûmetê dest bi girtina wan kir û di serê wan de Osman Sebrî bû. Evin, ew çend carên ku Osman Sebrî di gel hevalên xwe, ji rex hikûmetê ve hatine girtin:

1 - Roja 15/08/1960'î, di vê rojê de Osman Sebrî û Dr. Nûreddîn Zaza di gel çî û heşt /48/ endamên partî hatine girtin û li zindana Helebê û ya Mezê li Şamê mane ta roja 02/02/ 1962'an.

2 - Di sal 1963'an de Osman Sebrî ji ber hikûmetê revîya çû Libnanê û çend heyvan li wir maye.

3 - Di roja 21/05/1964'an de careke din ew û kurê xwe Hoşeng li Helebê hatine girtin di gel çend hevalên din û di zindanê de mane ta bi dawiya sala 1965an.

4 - Di dawiya sala 1965'an de, nû ji zindanê derketibû, lê careke din li Dêra Zorê hatiye girtin û çend heyvan li zindana wê jî maye.

5 - Di sala 1967'an de dema ji zindanê derketiye hikûmetê ew sirgûnî bajarê/ Siwêda/ kirine. Ew

bajarê ku li başûrê Sûriyê dikeve û pîrraniya xelkên wê Durzî ne.

6 - Di sala 1969'an de, dadegeha dewletê biryar daye ku Osman Sebrî bi du salan zindan bike..

Lê wî xwe ji Sûriyê daye alî û di tirkîyê re derketiye.. Li tirkîyê dûm nekiriye, piştî du heyvan zîvirîye Sûriyê, çend heyvan veşartî maye û dawî hatiye girtin û di zindana /Qellhe/ de li Şamê maye ta sala 1970'an. Di vê girtinê de du avokatan xwestine di dadgehê de bervedêriya wî bikin, lê ew bi wê bervedêriya wan razî nebûye.. Piştî ku hikmê xwe qedandiye û derketiye li mala xwe a li Şama Şerîf, taxa Kurdan rûniştiye..



Û wiha Apo Osman Sebrî 18 caran hatiye girtin û zindan kirin, du caran li Tirkîyê, du caran li Libnanê, du caran li Îraqê û 12 caran li Sûriyê û çendîn car jî li Sûriyê hatiye sirgûn kirin..

Li ser girtin û zindankirînê xwe wiha bersiva Firat Cewerî di kovara Hêvî, hejmara 7an, payîza 1990'î de daye:

(Em di bin destên xelkê de bûn. Gava ku merivek 52 salî be û 18 caran têkeve hepsê, dê çi têde bimîne? Ez 18 caran ketime hepsê.. Carekê hakimekî Erebi ji min re got:

(Ev cara çendan e ku tu dikevî hepsê?) Min got: ev cara min ya 17'an e. Hingê ez tenê 17 caran hatibûm girtin. Hakimê erebi got: (Xwedê mala te xera bike..). Min got, bela Xwedê mala we xerab bike. Lawo! Kengî min hatiye li deriyên hepsên we xistine, min gotiye mala min tune ye, cih bidine min..? Hun tîn min digirin û davêjin hepsê û di ser de jî mala min xerab bibe! Bela mala we xerab bibe! Gava ku min ev gotin kirin mêrik keniya...)

Dema ku Partiya Demokartî Kurdî li Sûriyê, di Îlûna 1965'î de bûye du perçe / Çep û Rast. Hingî Osman Sebrî û Cegerxwîn bi çepê El-Partî re mane û Apo Osman bûye sekretêrê wê ta sala 1969'an. Vê paşiyê Cegerxwîn ji wan veqetiyaye û xwe bi rastên partî re girtiye, ji ber ku Osman Sebrî wek şert li ber hevalên xwe yê di partî de danîbû ku; Cegerxwîn xwe ji komîta Merkezî/ Navendî/ re, nehilbijêre.. Çiko ne xerce.. Li gor dîtina Osman Sebrî..

Erê, Osman Sebrî ev ê ku tev jiyana xwe di ber welat û welatîyên xwe de xerc kir û bi taybetî di ber kurdên sûriyê de..

Mirov dikare bibêje ku ew yek bû ji beşdarên serhildana Şêx Seîdê Pîran di sala 1925an de.. Endamekî komela Xoybûnê bû û lehengek ji lehengên şoreşa Agirî bû di sala 1930'î de.. Duyemîn nivîskarê kovara Hawara mîr Celadet Bedirxan bû, piştî Qedrî Can.. Ji kurdên Rojava, ew yê tekane bû ji nav kurdên sûriyê ku di sala 1933 û 1936'an de, desthilata Fransî di sûriyê de ew sirgûnî Felestîn, Arîterya û Medageşker kirin.. Demezrênerê sereke bû ji (PDK) li Sûriyê di sala 1957'an de.. Û ew bû ku gotiye:

Xwe danînim ber sîtem û zorê
Divê serbilind ez biçim gorê
Gava bi rûmet biçim goristan
Hêjaye bibim lawê Kurdistan.

Sed mixabin ku roja îro rêkxistinên me yen siyasî, nikarin tev bi hev re bîranîna wî pêk bînin û yekîtiya gotina xwe diyar bikin..!! Xweş bawerim ku em karibin di bîranîna Osman Sebrî de bibin yek û bi hev re bîranîna wî ji gelê xwe re bînin ziman, hingê em ê karibin gotina xwe jî bikin yek..



Qûnaxa dawî; Osman Sebrî li Şamê di Salên 1971-1993'an de

Ji sala 1971'an û virde, hikûmetê nasnameya /vatandaslik/ jê standin, wek biyaniyekî lê nerîn û herdem û gav di bin çavnêriya karbidestan de bû.. Tevî ku rêka Ewropa li ber vekirî bû, lê destê wî ji welatîyên wî ne dibû û her dem digot:

(Ez ji nav welatîyên xwe nalîyîm, ya Kurdistan û yan goristan..).

Di vê demê de careke din li Şamê, taxa Kurdan, dest bi fêkirina zimanê Kurdî kir û bi dehan xort û keçên Kurdan hînî xwendin û nivîsandina zimanê Kurdî latînî kirin.

Hem jî, di wan deh salên dawî de, mala wî li Şamê bibû wek qûblegehekê ji Kurdan re, nemaze ji rewşenbîr û welatparêzan re; xwe li mala wî digirtin, hevpeyvîn pêre çêdikirin û bîranînên wî tev didan..

Di wan deh salan de jî, çend helbest afirandin û çend gotarên bedew li dor ziman nivîsandin..

Di sibata 1983'ê de, bi keda Dr. Kendal Nezan, Enstîtûya Kurdî li Parîsê hat damezirandin û vekirin. Hingê Osman Sebrî jî digel van nivîskar, rewşenbîr û siyasetmedarên Kurd ji hîmdarên wê bû: Cegerxwîn, Ordîxanê Celîl, Heciyê Cindî, Yilmaz Guney, Hejar, Kendal Nezan, Qenatê Kurdo, Remzî,

Osman Sebrî, Îsmet Şerîf Wanlî, Tewfîq Wehbî,
Nûreddîn Zaza.

Piştî ku enstîtûya Kurdî li Parîsê hat vekirin, Osman Sebrî çend gotar û helbestên xwe di nav rûpelên kovara /Hêvî/ de belav kirin. Ew kovara ku ji rex Enstîtûya Kurdî a Parîsê ve dihat weşand.

Ev e helbestek wî bi navê (Ziman), ku ji kovara /Hêvî/ re nivîsandiye û têde hatiye velav kirin:

Dil pirr dixwaze ku Hêvî hêvîya Kurdan be
Di warê ziman û zanistî her xwedî şan be
Zaravayê me bigihîne serhev di pêşên de
Kurdan nehêle di nava cîhanê şermende.
Heya bi îro em tenê em bê zar û ziman bûn
Di nava gelan pirr bi şûnda, gelek nezan bûn
Îro jî dibînim, gelek xwendayên me kurdan
Gelparêzin ew, haya wana nîne ji ziman.
Çawan bê ziman, gel di cîhan tête parastin?
Bi çi lebatî maf û rûmet, hatine xwestin..
Tenê bi ziman mirov cuda bûye ji dehban
Pê xwend zana bû, firriya xwe gihanda ezman.
Lewra divê em ji bo ziman, xwe blwestînin
Heya bikarin kurdan ji tengayê derînin.
Bijîn kesên ku ji bo ziman dikin xebatê
Em in berê gel digihêzine riya felatê.



Di sala 1984'ê de pirtûkek kiçik bi navê /Çar Leheng/ li Şamê çap û belav kir. Her çar bûyerên vê pirtûkê di salên 1965-1966'an de di kovar /Çiya/ de li Ewropa hatibûn belavkirin.

Di her çend salên dawî de Apo Osman hin bi hin li xwe dişkenand, pîrbûnê zoriya wî dibir.. Lê di cewherê xwe de, her ew wek xwe bû, her ew têkoşerê serbîlind bû, wek bazê serê çiya bû, wek pêşmergeyê ku bi rextê fişekan pêçayî bû, her ew xemxur û zikêşê gelê Kurd û Kurdistanê bû.

Osman Sebrî di tevahiya jiyana xwe de, mîna Cegerxwîn xwestiye ku gelê xwe hişyar bike û wiha wî jî êş û jana gelê xwe anîye ziman.. Rêya rizgarî, jiyanek bi rûmet û bextewar şanî milletê xwe daye. Ne tenê zilm û zora mêtîngehkarên beyankiriye, belê her wisa neheqî û necamêriya axa, beg û şêxan jî

aniye ziman û ji bo gundî, reben, belengaz û jarên welatê xwe têkoşîn kiriye.

Di pêşgotina pirtûka xwe ya bi navê "Apo" de, poetîka xwe wiha dest nîşan dike:

(Helbest û çîrok tenê bi rê û rêbazên hişyarbûn û berxwedanê dikare pêşengiya gelê xwe bike û wan ji bo têkoşînê rake ser piyan..)

Osman Sebrî, her çiqasî li Binxetê mabe jî, wî her têkiliya xwe bi welatparêz û têkoşerên kurdên Bakur re parastine û girêdayî hiştine.

Di sala 1962'an de dema ku nemir Edîp Karahan li Stenbolê rojnameyekê bi navê Dicle-Firat diweşand, hingê Osman Sebrî ev helbest jêre nivîsandiye û şandiye:

Min hêvî heye Dicle-Firat barê me rake

Di warê ziman li rojhelat xelkê me şa ke

Zimanê me yê paşde mayî çiçekî bide pêş,

Va ye bo wî sipasên xwe ez dikim pêşkêş.

Roja duşemê 11/10/1993'an, piştî nîvro Osman Sebrî, di mala xwe de li Şamê, taxa Kurdan ya ku dikeve pala çiyayê Qasiyûn de, gewrika dinyayê winda kir.

Di wan her du katejmîrên piştî mirina wî de, ku mîrov temaşe kiriba wê bidîta ku piraniya Kurdên Şamê xwe li mala wî digirtin û dicivayan.. Bi xem û keser li ber deriyê mala wî kom dibin û bidêm tirşî û talî silavê li hev dikin û vedigerînin..

Di nav wan kesên ku li qorzîyeke hewşê kom bibûn
keç û jinekê hev girtibûn û digiriyan, wan xweş dizanî
ku yê mirî kî ye.. yek ji wan /Kewê/ bû, keça birayê
wî, ya ku buhara temenê xwe di xizmet; hilanên û
danîna apê xwe de xerckiribû.. Ya din Diya Ciwan bû.



Ez û Apo Osman Sebri di sala 1989'an de

Xweş tê bîra min – wek îro- çaxê ku ez diçûm mala
Apo Osman li Şamê, wî gopalê xwe li erdê dixist û
bang Kewê dikir û digot:

Kewê çayî bîne..!

Tevan bi xem nûçeya koçkirina Apo dipejirand.. Erê,
nexasim ew xort û keçên ku şagirtên wî bûn û di bin
bandora wî de dest bi xwendina Kurdî kiribûn..




Li rexekî din ji hewşê, çend xortan hêsrên xwe bi dizî ziwa dikirin.. Ew jî, ji şagirtên Apo Osman bûn, yek ji wan Îbrahîm Zaza bû, yê ku di her deh salên dawî de ji Apo Osman qut nedibû. Vî mirovî, piraniya dema xwe li mala wî de dibûhirand û li ber destên wî fêrî xwendin û nivîsandina zimanê Kurdî bibû.. Wek neferekî mala wî dihat nasîn...

Û wiha di wan herdu katjimêran de gelek kesên din jî hebûn ku xemgîniya xwe li ser koçkirina Apo diyar dikirin bê ku hajê kesî ji wan hebe. Bêguman hestekî dilsoz ew dehif didan. Ji ber ku ew xweş serwextî jiyana Apo bûn û baş bi qîmet û nirxê wî zanîbûn.. Nemaze dema ku didîtin Kurd û biyanî xwe li malê wî digrin lavelavê dikin ku şorekê, peyvekê an gotinekê ji devê wî bigrin, tomar bikin û binivîsin.

Wê şevê termê Apo di mala wî de ma, li hêvîya hatina kurê wî Dr. Hoşeng ji Almanya. Roja din danê êvarê 12/10/1993'an, di gel kawanekî zexim ji

otomobîlên Kurdên peşdarbûyî, termê Apo Osman Sebrî di rêka Helebê re guhestin Cizîrê, bajarê Derbasiyê nav Kurdan û ew di goristana gundê Berkevîrê de spartin xaka sar û cemidî.



Ev gund girêdayê navça Derbêsiyê ye, dor 15 km ji sînorê Tirkîyê dûre.

Wiha ronahîya stêreke geş û bi çirûsk ji esmanê Kurdistanê rîjiya, belê pir stêrên geş li şûn xwe vêxistî hiştin.

Sed rehmet li giyanê Apo Osman Sebrî û giyanê tev şehîdên rêka felat û azadiya welatê me bibare.

Ji Pirtûkên Osman Sebrî yê çapkirî

1 - Elifbêya Kurdî 1954/ Şam:

Ji 54 rûpelan pêk tê, bi hin helbest û nivîsên wî xemilandiye. Li ser qaba wê a pêşî wiha hatiye nivîsandin; Pêşkêş ji bo karker û cotkarên Kurd ku dixwazin hînî xwendina û nivîsandina zimanê xwe bibin. Li ser qaba dawî wiha hatiye bivîsandin; Çapkirina vê elifbêya cara duyemîn, Partîya demokrata kurdê Suriye Pêk aniye. Xuya ye ku du caran hatiye çap kirin.



2 - Bahoz û çend nivîsarên din 1956/ Şam:

Ji 68 rûpelan pêk tê, tev helbest in. Ji bil helbesta Bahoz, van her şeş helbestên din jî di nav rûpelên xwe de kom dike: Bang (Ji bo keç û lawên cîhan li

mihrcana pêncan), Jan, Ji dest Bextê reş û hevalên
şaş, Feleka Bêbext, Wefda Kurdî, Ho Xort.



3 - Dêrdên Me 1957/ Şam:

Ji 32 rûpelan pêk tê, bi piranî gotarên ramyarî û li
dor ziman in, di gel çend helbestan, ew jî evin:
pêşgotinek, Kolegîriya Ramanê, Ziman di Jîna
Miletan de, Diçin Hec (Helbest e), Raman di Navbera
Aferîn û Vacabûnê de, Newroz (Helbest e),
Welatparêzî di Navbera Duh û Îro de, Fedekarî,
Şêrê Sîrk (Helbest e), Elifbêya Kurdî.



4 - Apo, Gotinên xav napijin bê tav 1981:
Helbestên vê dîwanê rehmetiyê hêja Hemereş Reşo
ji kovarên Hawar û Ronahiyê daye hev û bi
pêşgotina xwe û pêşgotina Dr. Nûreddîn Zaza di sala
1981'ê de li Almaniya çapkiriye.

5 - Elifbêya Tekûz 1982/ Şam:

6 - Çar Leheng 1984/ Şam:

Ji 56 rûpelan pêk tê, ew jî kitêbokek bi çûk e, wek
Bahoz û Derdên me ye. Naveroka wê, li dor bûyerên
ku bi serê çar lehengên Kurd hatiye. Bi têr û tesel
şrove dike, ew jî evin; Ferzende di şoreşa Agirî de,
Seydxan ji Serhedê, Remezani li çiyayê Sasûnê û Adil
Beg li dor Amedê.



Mamoste Osman Sebrî di pêşgotina bi navê (Çend Gotin) wiha dibêje:

(Ev her çar bûyerên ku di dûrvê pirtûkekê dadidim çapê, berî hejde salan min ji kovara ÇIYA reşandibû û têde hatibûn belav kirin. Îro jî dixwazim van bûyerên ku berî çil-pêncî salî hin birayên me ên kurd pê rabûne û li pêş neyaran bi çî mêraniyê şer kirine û bi xurtiya dilên xwe çawa çevê dijmin şikandine û serê gelê xwe bilind kirine, ji nû ve bidim ber çavên xortên Kurd, da bizanin rûmet, mêranî û gelparêzî çawa bûye û me îro çî divê bikin..)

7 - Berseva Hoşeng 1977/ Şam: Helbestek dirêj e. Min hin ji vê helbestê di dawiya vê pirtûkê de balvkiriye.

8 - Şerrên Sasûnê 2005/ Şam:

Apo Osman Sebrî ev pirtûka bi navê (Şerrên Sasûnê), ji ser zimanê Abdulrehman Axayê Eliyê ûnis nivîsandiye û di sala 2005'an de, ji rex D. Zengî

ve li Şamê hatiye çapkirin. Ji 100 rûpelên orte pêk têt.



9 - Piştî damezirandina Partî Demokrat a kurd li Sûriyê (P.D.K.S) (Al-Partî), di roja 14/06/1957'an de ku Osman Sebrî hîmdarekî sereke bû tede, vê partiyê di sala 1960'î de, di bin şewirdariya wî de rojnameya (Dengê Kurd) bi kurdiya Latînî hatiye weşandin. Mixabîn çendî min pirsî û xepart ku hejmarekê jê bibînim, lê min nedît..

Li gor ku min ji mamoste Hemîd Derwêş pirsî, wî got:


(Di serê sala 1960'an de me Dengê Kurd bi kurdiya latînî diweşand, tê bîra min; Dr. Nûreddîn Zaza gotarekî Maw Tisî Tong, ji Fransî wergerandibû kurdî bi navê (Serberdayetî) tede belav kiribû..)

Li gor ku ji min re got, ev rojname (Dengê Kurd), ji rex komîta navendî a P.D.K.S di navbera salên 1960

û 1963 an de derketiye, û ji kesên ku têde dinivîsandin ev bûn; Dr. Nûreddîn Zaza, Osman Sebrî, Reşîd Hemo, Cegerxwîn û Hemîdê Derwêş..

Di sala 1979'an de, Partiya Demokratî kurdî li Suriyê (Al-Partî), di bin şîretên Osman Sebrî de kovara (Gelawêj) weşandiye. Û navê wê ji (Gelawêj) a Kurdên Îraqê, ewa ku rehmetî Îbrahîm Ehmed û hevalên xwe di salên 1939-1944'an de li Kurdistana başûr diweşandin, girtiye.

Hêjaye gotinê, piştî mirina mîr Celadet Bedirxan di sala 1951'ê de û bi taybetî di salên 1955 û 1956'an de, Osman Sebrî, di mala Rewşen xanim Bedirxan de, dor du salan kar di berhevkirina tîpên ferhenga Mîr Celadet de kiriye. Hêjaye gotinê ku ev ferheng di sala 2009'an de li rex weşanxaneyê Avesta ve li Stenbolê hatiye çapkirin. Hem jî hêjaye ez bêjim ku Newroza 1957'an, di bin navtêdana Osman Sebrî de li Şamê hatiye pêk anîn. Ew yekemîn sal bû ku cejna Newrozê di nav kurdên Sûriyê de tête piroz kirin.



Ji pendên ku min ji ramanên Apo Osman Sebrî bijartine

1 - Ji kovara Pêşeng, hejmara 5an sala 1984'an:

* Parastin û geşkirina xwendin û nivîsandina Kurdî li ser milên her Kurdekî dilsoz û welat-parêze, bi taybetî xwendayên me, çunkî ziman rolekê giring di jiyana her netewekî de dimîne/ dihêle.

Zimanê me jî gelekî li paşdaye û gereke em bi zimanê xwe mijûl bibin, hingê em qencyê li xwe dikin, bîrberek dibêjît: (ku tu bixwazî bizanibî kesekî çendî xizmeta milletê xwe kiriye, binêre ku wî çiqasî xizmeta zimanê xwe kiriye...)

* Ji bo yekbûna zimanê kurdî, yanko pêkanîna şewekî yekgirtî bo xwendin û nivîsandina kurdî, gereke li pêş da zimanvan û şarezayên her zaravayekî bixebitin ko zarava xwe rêk û pêk bikin û ji peyvên biyanî pak bikin û peyvên resen ji pîr û kalan û gundiyan werbigrin û binivîsin, û pişt ra zana û şarezayên wan hemo zarava bi hev ra rûnin û bixebitin û bi harîkarî û dan û standinê li gel hevdu piştî demekê dirêj wê bikaribin şewekê yekbûyî ji bo zimanê kurdî pêk bînin.

Helbet Enstîtuyeka mîna Enstîtuya kurdî a Parîsê dikarît rulekê giring di vî warî da bibîne. Lewra nabe her kes bi serê xwe peyvên nû bêxîr nav zimanê

kurdî û gerek her tiştê nû li ser biryara zana û şarezayên zimanzan be, û ez bawerim demeke dirêj û xebateka berdewam jêra divê.

* Daxwaza min ji hemî xortên Kurd ewe ku çavên xwe vekin, dost û dijminên xwe ji hev nasbikin û destên xwe bidin hev bo rizgariya gel û welatê xwe.

* Mirovê gelparêz gereke van sê tiştan bi duristî biparêze:

1 - Canê gelê xwe


2 - Malê gelê xwe

3 - Namûsa gelê xwe

Her kesê destê xwe dirêjî yekê ji vana bike ew dibe rûreşê gelê xwe û xortên Kurd gereke dostaniya wan neke.

* Tu caran miletek hemî weka hev nafikirin û her hindeka bawerî bi ramanekê heye, vêca gereke her kes azad be di bîr û baweriyên xwe da, çunkî kes bi zorê weka mirovî nafikirêt, ez bi ramana xwe û tu bi ramana xwe, lê em birayê hevin.

Nabe em şerê hev bikin, ji ber ku em hemî ji bo rizgariya miletekî û welatekî dixebitin.



2 - Ji kovara Hêvî, a Parîsê, hejmara 7'an, payîza 1990'î: Hevpeyvînek Firat Cewerî bi Osman Sebrî re:

* Ziman, zimanê me gişka ne? Ne yê yekî an yê ddiwane, gava ku ji bo zimanê xwe bixebitin qencyê bixwe dikin. Ku ji bo zimanê xwe nexebitin ji wan re kêmasiyek e. Lê heyf e yên ku heya bi niha bi ziman mijûl dibin gelekî kêmin. Divê ku gelek mirov di vî warî de bixebitin, da ku çen hebên xort û jêhatî ji nav wan derkevin. Ta bi niha mecal tune bû, niha li Ewropa hinek birayên me bi vî karî re mijûl dibin. Wekî din li ku heye? Li Îraqê nahêlin, li Tirkîyê nahêlin, li vir nahêlin. Vêca em di vî warî de ne. Lê hê jî hin ji peyayên me dixwazin bi destên Ereban, Eceman û Tirkan welatê xwe azad bikin. Wey xwelî li serê me be!..

* Gelekan ji xortên me çavên xwe berdane nivîsandina helbestan, ev ne tiştêkî hêja ye, divê nivîsên rastesere bêne nivîsîn.. Belê, helbest tiştêkî

ji edebê ye, lê ne tevaya edebê ye. Divê ku mirov bizanibe bi zimanê xwe binivîsîne, lê nizanin, hemû ji min re helbestan çêdikin..

* Divê helbesta bi wezin û kafiye jî hebe û ya hur û serbest jî.. Divê ku mirov herdu babetan jî binivîsîne. Gava ku mirov aqilê xwe bide ser nivîsandinê, nivîsandin rehet e. Ez ne bawer im ku her mirov bikaribe vê bike, hin kesên ku qabîliyeta wan hene dikarin. Û ew celeb kes divê ku teksîr nekin. Gava teksîr bikin, gunehkariyeke mezin dikin. Îro divê ku em fedî bikin, ku em mîletekî bê ziman in. A niha pir xortên me hene, xwenda ne, bi Erebi jî xweş dizanin, dibêjin: (Em dê ji mîletê xwe re xizmetê bikin), lê naxwazin hînî zimanê xwe bibin. Û ez dê çawa ji wan bawer bikim?.

* Bo giringiya ziman jî wiha gotiye: Ger tu bixwazî welatparêziya yekî nas bikî, lê mêzeke çiqas bendewarê zimanê xwe ye..

3 - Ji kovara Hêvî, a Parîsê, hejmara 6an sala 1987'an:

* Em kurd negîhanin warên bikaribin welat xelas bikin. Lê neyarê me pir ehmeq in. Wê bi kêrî me bên. Bi Xwedê, sê ehmeqên mîna Kenan Evren, Xomeynî û Seddam kê mî tene dîtîn. Ewê me hişyar bikin. Mîlet bi du tiştan hişyar dibin: Yan bi darê zulmê yan bi xwendinê..

Jêderên ku min sûde ji wan girtine:

- 1 - Osman Sebrî: Kurtiyek ji destpêka jîna min/ kovara Pêşeng, hejmara 8'an / adara 1985'an.
- 2 - Kovara Hawarê, hejmara 52'an/ gotara bi navê Mirdêsan û Gawestiyên wan.
- 3 - Roja 23/08/1991'an li Şamê Apo Osman ev gotin ji min re got.
- 4 - Kovara Ronahî, hejmara 14'an/ gotara bi navê Şêrek bi darekî.
- 5 - Axayê Mirdêsi (Osman Sebrî) kovara Hawarê, hejmara 19'an.
- 6 - Kovara Hawarê, hejmara 21'an, gotara bi navê: Li goristana Amedê.
- 7 - Kovara Hawarê, hejmarên 28, 54, 56'an.
- 8 - Kovara Hawarê, hejmara 53an/ helbesta bi navê: Evîn.
- 9 - Osman Sebrî di hevpeyvînekê de/ kovara Hêvî, hejmara 7'an sala 1990'an.
- 10 - Kovara Pêşeng, hejmara 5'an sala 1984'an.
- 11- Kovara Pêşeng, hejmara 8'an adara 1985'an.
- 12 - Kovara Hêvî, hejmara 7'an sala 1990'î.
- 13 - Kovara Elhedef: Armanc, hejmara 4'an sala 1984/ kovara P.D.K/.
- 14 - Pêşgotina diwana Apo Osman, ji nivîsîna Hemereş Reşo û Dr. Nûredîn Zaza/ Ratingen - Almanya - 1981.

15 - Tev hejmarên kovara Hawar, Ronahî, Roja Nû û sê hejmarên kovara Stêr di gel tev pirtûkên Osman Sebrî.

16 - Kovara Aso, hejmara 1'ê sala 1992'an.

17 - Min gelek sûde li dor girtin û xebata Apo Osman sebrî, ji devê wî bixwe bihîstiya û her wiha ji Mecîdê Haco, M. Salih Gedo û hin kesên din bihîstiya.

18 - Her ku ez diçûm Şamê, min serek dida Apo Osman, di wan serdanan de ez pêre diketim giftûgoyan de li dor gelek babetan, nemaze jînenîgariya wî û ziman û rewşenbîriya Kurdî.

19 - Gotina (APO), rehmetiya Rewşen Xanim Bedirxan pêvekir û jêre bû naznavek. Dema ku di kovara Hawar û Ronahî yê de dixebitî, rehmetiya Rewşen Xanim navê wî hilnedida, wek rêzgirtin, bi navê (APO) pêre diaxîfî û wiha bi vî navî di nav Kurdên Sûriyê hat naskirin.



Ez û Kovan Xankî û Helbestvaniya Osman Sebrî

Berî çend salan mamoste Kovan Xankî ji zankoya Duhokê çend pirs li dor helbestvaniya Apo Osman Sebrî ji min re şandin; helbestvaniya wî, kesayetiya wî û qehremaniya wî.. Min jî, ev bersiv lê vegerandin. Fermo xwendevanên ziman û toreya Kurdî pirsên wî û bersivên min bixwînin.

1 - weke diyar ku Osman Sebrî berhemên kilasîk û nûjen jî hene; tu bi çi nerînê re ye, helbestvanek kilasîk e, yan nûjen e? Yan jî weke Cegerxwîn em bikin pir di navbera herdukan de?

Belê, wek ku ez û te serwextin, di jiyana Osman Sebrî de, bi tenê çend berhemên wî yê wêjeyî hatibûn çap kirin: Bahoz û Derdên Me/ 1956, vê paşiyê jî Bersiva Hoşeng/ 1977. Di sala 1981'ê de jî, rehmetî Hemreş Reşo, helbestên wî di dîwanekê de li Almaniya dane çap kirin.. Li gor xwendina min ji helbest û gotarên wî re û li gor ku helbesta kurdî a nûjen bi weşana kovara Hawarê û helbestên mîr Celadet, Dr. Kamiran Bedirxan û Qedrî Can destpêkiriye, ez Osman Sebrî di pey Qedrî Can re dibînim, ango berî Cegerxwîn. Ji ber ku Bahoza

Osman Sebrî berî Kîme Ez! a Cegerxwîn çap û belav bûye.

Eger Cegerxwîn bi dîwana xwe Kîme Ez/ 1973, wek helbestvanekî nûjen hatibe nas kirin, Osman Sebrî berî wî bi gelekî, ji heyamê Hawarê ve wek helbestvanekî ku li ser şopa Qedrî Can dikulkulî, hatiye naskirin. Lê di baweriya min de herdu jî (Cegerxwîn û Osman Sebrî) ji kilasîkan e û pirek qewînin di navbera kevin û nû de. Ji ber ku pirraniya helbestên wan kilasîkî ne, bi tenê hin caran nûjen hunandine..

Eger Osman Sebrî di hunandina helbesta nûjen de berdewam kiriba, bêguman wê, ew mîrê helbesta kurdî a nûjen ba berî Qedrî Can.. Lê mixabin siyasetê ew di nav pêlên xwe de revand û wiha dûtî wêje û toreyê ket.. Dawî ez dikarim bibêjm ku hersê jî (Qedrî Can, Osman Sebrî û Cegerxwîn), di warê helbesta nûjen de şagirtên mîr Celadet û Dr. Kamîran Bedîrxan in, ewên ku serwestî nûjeniya toreya Europî bûn û wan şagirtên xwe bi wê nûjeniyê fêr kirin...

2 - Cudahiya (ferqa) apo Osman Sebrî bi helbestvanên din re diçî deye?

Di baweriya min de, cudahiya Osman Sebrî wek helbestvan ji helbestvanên din, di berdewamiya hunandina helbestê de ye. Osman Sebrî wek Cegerxwîn bi berdewamî ne nivîsand, siyasetê agir bi semyanê wî yê wêjeyî xist...!

Belê Cegerxwîn jî siyasî bû û her wiha Qedrî Can jî û mamosteyên wan yên bingehîn mîr Celadet û Dr. Kamîran Bedirxan jî siyasî bûn, lê siyaseta ku Apo Osman dimeşand, ji ya gişan aktîvtir bû û vê yekê ew di warê wêjeyî de lipaş hişt û her wiha ev yek cudahiyeke Apo ye ji helbestvanên din.. Cudahiya din; mêraniya Osman Sebrî ye. Wê mêraniyê ew di Felestîn, Urdun û Madegêşkar re derxist.. Hevalên wî yên din man li Şamê û Cizîrê.. Cudahiyek din; Osman Sebrî divê bû berî helbestê xwe bigihîne welat (Kurdistanê)! Ango welat ji Apo re her tişt bû.. Ta ku wî navê Welat, li kurê xwe yê pêşîn kir û bang dikirê: Welato..

3 - Çima helbesta evîndarî (hezkirinê) li cem Apo Osman pir kême?

Osman Sebrî mirovekî ciddî bû. Ew di xortaniya xwe de pêrgî gelek bobelatên seyir û bi xwîn hatibû; şoreşa Şêx Seid û bidarvekirina mirovan li Amedê, şoreşa Agirî, kuştin, sirgûnî û talaniya şerqê ew his û hestê evîndariyê li nik wî qels û lawaz kiribû.. Mirov dikare bibêje ku kuştibû.. Vêca bi tenê welat ma bû evîna wî û wî welat di ser her tiştî re digirt.. Di baweriya min de ji ber vê yekê evîndarî li cem kême bibû.. Welat tev evîndariya wî jê dizî bû.. Tevî vê yekê jî helbestên evîndariyê hunandine, lê pirr kêmin.

4 - Eger apo ne di sêgoşeya (îraq, sûriya û turkiye) de ba, wê kasayetiya wî û helbestvaniya wî çawe ba?

Di baweriya min de wê kesayetiya wî a Axakî Kurdan ba, wê wek axakî kurdan li xwe meze kirba, bi tev irf û adetên axatîyê ve.. Wê axakî berberçîba.. Lê helbestvaniya wî, li gor cudahiyên ku di keseyetiya wî de hene, wê pîraniya helbestên wî evîndarî bana û hozpesinandinî bana.. Li gor ez serwextî jiyana wî me.. Apo Osman, li Şamê di nav endamên komela Xoybûnê de wek axayê eşîra Mirdêsan li xwe meze dikir û xwe kêmi kesî nedidit..

5 - Helbestên Apo Osman Sebri pir pir bi zimanek sadene (raste û rastîn), bi nerrîna te eve ji nirxê helbestvaniya wî kêmi nake? Û bi taybet ji aliyê rewanbêjîyê (Rehwaniyê) ve?

Qet na. Ji ber ku di wî heyamî de wiha dihat xwestin.. Ew heyamê ku nezanî û cehaletê konê xwe bi firehî di ser Kurdistanê re vegirtibû, ji deh gundan yekî xwenda peyda nedibû, ewên ku hebûn jî, mela û feqa bûn. Jixwe kurdewariyê bi wan destpêkiriye, ango dibistana Hawarê, ku em bavê netewa kurdi şêx Ehmedê Xanî bidin alîkî... Hem jî bi saya wan zimanê me hat parestin.. Careke din dibêjim na, li gor wî heyamî qet nirxê helbestê li cem Apo kêmi nake..

6 - Weke diyar ku helbestvaniya Apo hinekî kilasîke, gelo ew û erûza erebî (عروض العربي) di çawe bûne? Peyrewa wê kiriye?

Apo Osman di medreseya Rişdiyê de ta pileya pêncan bi zimanê tirkî xwendiyê û di pey re serê wî ketiye şek û pekên kurdewariyê de û ji bo vê yekê binxetî Sûriyê bûye. Ango wî bi zimanê erebî hiç nizanî bû. Li Şamê, bi saya mîr Celadet Bedirxan û kovara wî Hawarê dest bi nivîsîna kurdî kiriye.. Di ber re jî fêrî erebî û xwendina zimanê erebî bûye, lê fêrî erûzên erebî ne bûye, li ber destê meleyan nexwendiyê ta fêr bibe.. Belê her ew di ziman û folklorê kurdî de şareze û milevan bû. Nivîsandinên wî yên pexşaneyî ji yên tev nivîskarên Hawarê rastir, tekûztir û bedewtir bûn û wîna jî di helbestên xwe de bi serketî bû. Di baweriya min de wî erûzên helbestên xwe ji stranên kurdî yên folklorî girtiye.. Ev yek jî, ji zîrekiya Osman Sebrî bû.

7 - Pîreka Apo karî çend piştevaniya wî bike, di tev aliyên jiyane de û bi taybet jî dema di zindanê (hebsê) de bû? Pir peyiv di navbera wan de hebûn ku pîreka wî alîkariya wî weke zilaman dikir, tu hineka dizanî?

Bêguman rola pîreka wî hebû, lê ne ew rola ku tu dibêjî.. Diya Hoşeng jîna Apo Osman a dudwan bû. Apo di jiyana xwe de du jin anîne, diya Welato û diya Hoşeng. Diya Hoşeng Çerkezî bû, avê wê Şadya

Receb Doxoz bû. Jinek bê deng, bêhin fireh, ser nerim û bê gazin û lome bû. Kar û barê zarokan, malê û mêvanan hildigirt.. Lê Osman Sebrî ji koka xwe ve fêrî têkoşînê bibû, jina wî jî qîma xwe bi têkoşîna wî anîbû, qîma xwe bi feqîrtiya wî anîbû, ev yekane xweş piştgirtin bûn ji Osman Sebrî re û xweş navtêdan bûn ji berxwedan û têkoşîna wî re..

Di bawerîya min de ku kî jina Osman Sebrî ba, her wê Osman Sebrî ew Osman Sebrî ma ba, nedihat guhertin.. Belê rola diya Hoşeng gelekî mezin bû, spas jêre..

8 - Weke em dizanin te gelek çaran ew dîtiye û pêre rûniştiye, gelo kesatiyeke çawe bû? Tu dikarî çawe pesnê wî bidî?

Osman Sebrî mirovekê xwedî gotin bû, ji gotina xwe danediket, gotina wî jî cihê xwe digirt.. Evîndarê ziman û Kurdistanê bû... Di sincê xwe de mirovekî bêhin teng û zirz bû, zû bêhna wî teng dibû, her divîbû gotin a wî be û ew gotin cihê xwe bigire... Ku bi dest wî keta, wê dîktatorekî kurd ba, wek ku hevalên wî, yên ku ji destpêkê, pêre di tevgerê de bûn dibêjin..

Gelekî hez lehengên dîrokî wek Napalyon, Selaheddînê Eyûbî dikir.. Di sala 1977'an de ez çûm bal Cegerxwîn, min pirs Apo Osman Sebrî jê kir, li min vegerand û got: Ka Osmanê berê..! Min bihîstiye ku bûye sofî, diçe mizgeftê û nimêj dike..!

Mixabin ku di dawîya temenê xwe de, êdî nema huşê wî wek berê dikişand û hin çaran êrîşî heval û

hogirên xwe dikir.. Belê her ez wî, wek lehengekî ji
lehengên gelê kurd dibînim, wek torevanekî,
siyasetvanekî û têkoşerekî kurd yê pêşeng dinasim.
Dawî dibêjim ku Apo kurdekî orjînal bû.

Konê Reş

Qamişlo 31/01/2009

Institut kurde de Paris

Pêşgotina Osman Sebrî ji dîwana Cegerxwîn (Sewra Azadî) re

Osman Sebrî

Cegerxwîn

Jînenîgariya wî: Navê seydayê Cegerxwîn Şêxmûse, kurê Hesên, kurê Mihemed, kurê Mehmûd, kurê Elî ye. Elî ji nav Gurdilan, ji gundê Pêkendê hatiye nav Dekşûriyên gundê Hesarê.

Seyda di sala 1903'an de ji dê û bavekî feqîr hatiye dine. Berî ku mezin bibe bavê wî çûye rehetê, sêwî li nik xuha xwe Asyayê maye. Biçûkî berxortaniya xwe bi şivanî û cotkarî borandiye. Piştî vê demê, ji nû ve çav daye xwendinê û ketiye rêza feqehan. Di demekî ne pir dirêj de ketiye pêş hevalên xwe û şhadeta ilmê şerîetê li ser destê seydayê mela Ubeyd istandiye.

Di vê navberê de tevgerên serxwebûnê di nav Kurdistanê de dest pî kirî bûn. Şêx Seîdê rehetî bi şerrê serxwebûnê rabû bû. Lê mixabin ku bêbextî û dilreşîya şêx û axan nehişt ku ev xebata welatî biçe serî, şêx Seîd bindest û dîl, gelê kurd jî şerpeze û bê rûmet kete ber dest û lingê neyar. Ji bo çavşikandina milletê Kurd, kuştin, bi agir sotin, serjêkirin, ji welat derxistin, heps û nefî kirin, di vî warî de herçiya ji Tirkan hat, derheqê milletê Kurd de teksîr nekirin. Van kirên neyar, ruhekî nû di

seydayê me de hişyar kir û hezkirina Kurd û Kurdistanê xiste dilê wî.

Berî istandina icazetê Cegerxwîn bi feqetî çûbû Kurdistana Îraq û Îranê. Vê gerra han jî di canê seyda de şopeke çak û ronak hiştî bû. Derdê millet hêdî hêdî bîr dibir. Millet ji nezanî û bêtifaqiyê dîl û blindest nabû; şêx û mela, beg û axa ji van kêmasiyan berpirîsyar bûn. Ji lewre berê xwest şêx û melan ji wacibê wan hişyar bike. Lê dema dît ku wan çav dane xwarina malê millet û bindestiya wî, û dest dane destê neyaran û xulamîya wan; xîreta seyda qebûl nekir ku di nav wî refê bêbext û bêrûmet de bimîne, rabû cibbe û şaşik avêtin û wek camêran destên xwe vemalan û daket qada xebata welat. Ev e tiştê kurt û serpilkî ji jînenîgariya seydayê Cegerxwîn.

Ew Bi Xwe: Ev bûn 23 sal ku seydayê Cegerxwîn nas dikim. Bi hikmê vê nasîna dirêj, min du meziyetên çak di seyda de dîtine ku hêjayî salixdanê ne:

1- Cegerxwîn derdê millet, bela mileltê Kurd di mîr û paşan, beg û axan, şêx û melan de dibîne. Bêşik seyda di vê ramana han de ne î şaş e. çima ku ji hezar salan û virde, ev kesên han pêşî, sermiyan û rêberên vî milletî bûn. Cihê ku can, mal û welatê wan biparastana, çav dan xwarina malê wan û ew dîl û bindest, û welatê wan bi destê neyaran ve berdan. Cihê ku ew bidana xwendin, zana û fêr û jîrek

bikirana, tevde nezan û bê raman û bê armanç hiştin. Cihê ku yekitî di nav millet de banîna pê, rik û beriberî xistine nav kurdan, û hemî kirin neyarên hev. Bi vî awayî ew û welatê wan xistin bin destê neyara. Tenê têr nake ku em bikarin fikreke baş li ser van kesan bidin xwendevanan, şêx û melan bangîna xwe ji miriyan dikirin; mîr û paşan, beg û axan jî bangîn ji neyarê millet û welêt kolîdar dikirin.

Ji lewre Cegerxwîn bê dilovanî kêmî û kêmasiyên wan dibêje, û millet serwextî fen û xap, bêbextî û dilreşiya wan dike. Ez bawerim ku seydayê Cegerxwîn di vekirina cavê kurdên Sûriyê û nîvrojê Tirkiyê de şopeke mezin û hêja hiştiye.

2- Cegerxwîn di kurdîtiya xwe de rast û durust e. Ewçend rast û durust ku, di riya welat û welatîyên xwe de sînga xwe ji zîvarî û belengaziyê re vekiriye. Bi çav min ev yeka han koça fedakarî ya dawiyê ye.

Ji vê pêve; di rojên tengî û zîvariye de jî, dilgeşî û comerdî ji Cegerxwîn bi dûr neket. Rojekê min ew dilteng û bêhêvî nedît, çî dema lê qewimîye tevî zîvariya xwe her û her destê alîkariyê dirêjî heval û hogirên xwe kiriye.

Ji vê bi şûn de, seydayê me di riya welat û welatîyên xwe de gelek west û êş, renc û zor, heps û neheqî jî dîtine. Îro dibînim seyda bi gavên xurt û camêr berve armanca xwe diçe. Bi navê hevaltîyê ez wî pîroz dikim û jêre pêşveçûneke çak dixwazim.

Dîwana Wî: Herçî ev dîwan, ji dîwana seyda a pêşîn bi gelekî xweştir û hêjatir derketiye. Di dîwana pêşî de, seyda ne hinde xurt û ne jî di armanca xwe de dûrbîn û yekrû bû; lê ev dîwan li ser armanceke xuya hatiye nivîsîn û rû û rêça wî têde xweş diyar in.

Gelek mixabin ku ji ber hin sebab me nikarîbû tevayiya dîwanê çapke û me ji bo îro bi ewqasî têr kir. Ez gelek hêvîdarim ku dîwana seyda a sisyan hîn xurttir û hêjatir be. Heye ku ev dîwan di çapxaneyên Kurdistanê de bête çapkirin. Ma kî dizane ku pêşende di himbêza xwe ya nediyar de ji bo gelê Kurd çi vedişêre.

Şam, 5/ 10/ 1954

Osman Sebrî

Osman Sebrî

Nivîsevan û Helbestvan*

Dr. Nûreddîn Zaza

Di xwendin û nivîsandina kurmancî de Osman Sebrî jî şagirtê rehmetî Mîr Celadet Bedirxan bû. Piştî derketina kovara Hawarê di sala 1932'an de ewî zû têde dest bi nivîsandinê kir. Di pêşiyê de, bi kurdiyeke rast nivîsandin jê re jî hêsan bû û Mîr jê re rêz û dûzanên zmên digotin. Lê her wekî Osman peyayekî zîrek û hingê xort bû û bi kurmanciya axaftinê xweş dizanî, di demeke kurt de xwe hînî kurmanciya nivîsandinê, kurmanciya bilind kir.

Li ser vê, di HAWARê de, nivîsanên wî yên rengareng derketin: Li ser dîrok, civat, zman, sinc û serpêhatiyên têvel.. Thomas Bois, kurdînasê bi navûdeng, di kitêba xwe de (Connaissance des Kurdes)- Naskirina Kurdan- bi pesin behsa awayê nivîsandina Osman Sebrî dike û kêfa xwe pir ji çîrokên wî yên li ser nêçîr û nêçîrvanan tîne. Lê, meydana ku lê, ji her tiştî bêtir, O. Sebrî şarezahiya xwe nîşan dide helbest û marşên wî yên neteweyî ne.

Bi hezaran law û keçên kurd ên Sûrî û Tirkiyê bi xwendina wan ji kurdbûna xwe ageh bûne, hej welat

û milletê xwe kirine, ji bo azadiya wan rabûne ser
xwe û canbêzariyine mezin kirine û îro jî dikin.
Belavkirina wan welatparêziyeke mezin e.

Dr. Nûreddîn Zaza
12/3/1980

* Ev gotina Dr. Nûreddîn Zaza ye, ji pêşgotina
dîwana Apo re a bi navê (Apo, Gotinên Xav Napijin
Bê Tav), ku di sala 1981ê de li Almaniya ji rex
rehmetiyê Hemereş Reşo ve hatiye çapkirin.

Institut kurde de Paris

Hevpeyvînek bi Osman Sebrî re

Di sala 1990'î de mamoste Ehmed Icê sernivîserê kovara (Roj) hevpeyvînek bi nivîskar û têkoşerê kurd Osman Sebrî re amadekirbû, lê ji ber çend sedeman ev hevpeyvîn di kovarên kurdî de nehatibû belavkirin. Di sala 1999'an de, bi helkeftina rojabûna wî, ev hevpeyvîn di kovara (Roj), hejmara 11'an de hat belavkirin. Min jî, ji ber giringiya bersivên Apo Osman Sebrî, ez vê hevpeyvînê, wek ku di kovara de belavbûye, diwêşînim.

Konê Reş

P - Di warê edebî de, xebata we xwedî dîrok e. Guhdan û destpêka we ya wêjeyî, vedigere kîjan salê?

B - Guhdan û destpêka min di wêje de vedigere qedandina xwendina sertefîka û hezkirina min ji pirtûkên dîrokî û wêjeyî re. Nîzîkbûna min ji hoza Mirdêsan ji alîkî ve û ji alîkî din ve geşkirina agirê şoreşa şêx Seîdê Pîranî û paşê vemirandina wî agirî li ser destê hikumeta Kemalî. Di van bûyeran de, hemû riyên serhildanên kurdan hatibûn birrîn. Ji lewre min xwest, çîrokên şoreşê wek derdekî li nik min peyda bibûn ku wan derînim. Geh bi gazin û geh jî bi hawar..

Şer ji bo min her tişt bû. Agirê şoreşa kurdan di hişê min de vêketî bû û pirrtirîn ji caran ez bi wî agirî

ve dihatim sotin. Lê piştî gotina Celadet beg, di hevdîtinek me de, gotibû: (Em ferz bikin ku mirovek bi tenha xwe Kurdistanê ava bike, mafir mirovek dikare wê bixîne..)

P - Osman Sebrî, di hemû berhemên xwe yên edebî de, ji hemû torevanên kurd nêzîktirî rastiye ye. Gelo sedema vê nêzîkbûnê çi ye?

B - Dibe ku ev yek li ber çavan be. Lê yê ku qîma xwe bi vê yeka hanê bîne, ev nerîneke xweser e. Eger ez ji hemîyan nêzîktirî rastiye me, her nivîskar xwe bi vê yekê razî dike. Çiqasî ê nivîskar di doza xwe de rastiye bi cih dike, ew nivîskar nêzîkî rastiye dibe û bê şik ew buhayê ramana xwe winda nake. Rastiya ramanê wek tacekê ye, nayê veşartin. Eger rastî neyê parastin, bê şik ê nivîskar dikeve durvê xapandin û tehlûketê (Pampaxiyê). Rastî rêyeke bi gavan nayê pîvan.

P - Di Bahozê de Osman Sebrî dibêje: Guh bidin Hurmiz. Serketin a wî ye. Û a xêrxwaza ye. Ehremîn namîne, zordestî nadomîne. Bahoz hêviyeke mezin li bal xwendevanan çêdike û baweriya wî bi kêşa milletê kurd xurttir dike. Di vê babetê da Osman Sebrî ji bo doza milletê kurd û parastina mafê wî, çi rêyê jêre dibîne?

B - Raste dema ku ramana çak di wî şerî de (Şerê Hurmiz li dijî Ehremîn), bi ser dikeve, hingê serketin dimîne a wî, a Hurmiz a mirovên çak û xwedanên ramanên gihiştîne. Di vê rêyê da, divabit her kes bimeşe. Huv- huva bahozê û ya her bayî ku tê û

dikeve guhên cîhanê û guhên mirovan, dê wan hişyar bikin. Ew bawerî a Hurmiz, ew Xwedanê herî çak ku li dijî Ehremîn şer dike. Serketin a ramana çak e. Lê herçî Hurmiz, ew bixwe mehkumê ramanên kirêt e, ku di dawî da dişke. Bê şik serketina Hurmiz, şikestina zordaran û bendewariyên wê ne.

Baweriya herî mezin di Bahozê da, ew bû ku tenê di rêya xêrxwazan da ev doz dighêje serî û bi dawî dibe. Ev yek ji bo parastina mafê wî çareserî ye. Rêya hemî rast û durist, guhdana Hurmiz e. Hêviya min ew bû ku milletê kurd guh bidin ramanên herî çak û di vê dozê da, xurtiya xwe bikin yek û li dijî zordaran derînin. Bê şik, ev rêya Hurmiz e, a xêrxwazan e, a felata kurdan e.

P – Toreya kurdî bi berhemên helbestan zengîn e. Lê xizanê çîrok, şano û ramanê ye. Sedema vê zengîn û xizaniyê çi ye?

B – Ezbenî ev bendeke herî mezin e. Min dil heye ku bi saluxdaneke zanistî bersivê bidim xuyanîkirin. Wisa hatiye nasîn ku edeba kurdî tenê bi helbestan zengîn e, ev durve ji ber çavan nayê veşartin.. Bê şik gunehê vê yekê, ne xwendina ziman û ne hînbûna nivîsandina bi zar xwe ye. Lê di demên pêş da ev yek wisa namîne. Her wisa jî xizaniya şanoyan girêdayî ye bi zimanê kurdî ku em kurd bi pirraniya xwe dûrî zimanê xwe yê zikmakî ketine.

P – Dem tête guhertin. Pêre ahêng û ramanên mirova jî tête guhertin. Ji bo guhertinê awayên nû

peyda dibin. Pirsî min eve; di warê toreyî kurdî da, ji bo dema nû hûn çî awayî jêre pêwîst dibînin?

B - Bê şik, bi demê re her tişt têne guhertin. Di vê babetê da pêşvebirina wêjeya kurdan û peyda kirina awayên nû pêwîstiyêke dîrokî ye. Hemû guhertinên di wêjeyê da peyda dibin ku ne li ser hîmên baweriyê bin, bixwe guhertinên wisa naçin serî. Wêjeya kurdan bi hewceyî guhertinên nûh in. Tiştê din eve; divabe ku em bi guhertinan bawer bin. Ji ber ku di guhertinê da hunerî peyda dibin.

Bê şik ew awayên nuh ku di toreyî kurdan de peyda dibin, divabe bi hunerê xwe nuh be, û bi rewşa xwe ne qels bin.. Çawa mirov li gor demê jiyan, çand û baweriyên xwe hene, ku têde dijî, wisa jî weje.. Di guhertinên nuh da pêwîste ku nivîskar bi doza guhertinê û peyda kirina awayên nuh bawer be.

P - Ku mirov we dibîne govara Hawarê bi xwediyê xwe ve mîr Celadet Bedirxan di bîra mirov da têt. Xebata we di Hawarê da di gel mîr Celadet da, we çî xebat kiriye?

B - Xebata min di Hawarê da vedigere sala 1932'an, çend sal bi şûn da, ez li Eyn Erebe (Kobanê), bi cî bibûm. Hingê bi Celadet beg re li ser dora bûyerên dijwar em axifî bûn.. Çend sal di wê navê re derbas bibûn, Celadet Beg dest bi weşandina Hawarê kiribû. Hingê rehmetî ji min xwest ku di Hawarê da xwedî cî bim. Di hejmeta 2'an da, ez derbasî nav koma nivîskarên Hawarê bûm. Xwediyê Hawarê Celadet Beg rewşenbîrekî mezin bû. Di hin babetan da, ez ji

wî nerazî bûm û xwedî gazin bûm. Ji gazinên min ev bûn: Di Alfabeya wî da çar tîpan cî negirtibûn..

Yek caran Celadet Beg hawar dikir û digot: Hawar hawara kurdan e.. Hawar rêyên xebat û têkoşîna kurdan dide nasîn.. Ji lewre welatparêz û rewşenbîrên me li dora wê kom dibûn û her yekî ji aliyê xwe ve, Hawar zengîn dikir.

P - Berî ku Osman Sebrî mirovekî torevan be, xebateke wî siyasî dirêj heye. Gelo, di vî warî da hun xebata tevgera kurdî di Sûriyê da çawa dibînin?

B - Tevgera kurdên me, tevî kêmasiyên wê xwedî dîrok e. Kurdên me ji mafê xwe bê parî, ên milî û çandî û civakî. Tevgera kurdên me, bi tevaya xwe di kêmasiyan da dimeşe.

Pêşketina tevgerên me û serbestiya wan, di yekîtiya wan da ye, ez dibînim. Her wisa jî di her perçeyê Kurdistanê da. Kurdên me çavên xwe ji vê yeka hanê girtine. Ji pêwistiyên tevgera kurdên me divabe ku bibin arîkar ji bo xurtkirina danûstandinan di nav wan da û vejandina çanda netewa kurdan. Hînkirina canê arîkarî û dostaniyê di nav tevgera kurdan da, di hemû perçeyên Kurdistanê da.. Çareserîya tevgera kurdên me di vê guhdanê da bi cî dibe. Tevî ku tevgera kurdan di sûriyê da, ne wek nola ên dinin, lê bingeha têkoşînên hemû tevgerên kurdan yek in.

P - Li ser dora damezirandina Xoybûn, hun dikarin tişteki bêjin?

B - Damezirandina Xoybûnê vedigere sala 1926an. Ev komele bi arîkariya çend welatparêz û rewşenbîrên kurdan ve li Beyrûtê hatibû damezirandin. Xoybûn, di bin serokatiya Mustefa Şahîn Beg û Bozan Beg da bû. Têkilî û xebata min di komelê da li ser destê Celadet Beg bû. Lê herçî dûrketina min ji Xoybûnê vedigere sala 1938an. Di vê salê de, min bi çend kesên welatparêz re komelek di bin navê (Yekîtiya Xortan), damezirand. Ji armancên vê komelê hînkirina xort û keçên kurdan, fêrkirina xwendin û nivîsandina zimanê kurdî. Lê ev komele û xebatê wê neçûbû serî.

P - Osman Sebrî wek mirov jiyanê çawa dibîne? Û ji bo jiyandina xwe çî dibêje?

B - Nerîna min eve ku jiyan emaneteke giran buhaye û bi tu kesan re neçûye gorê, mirov dispêre mirov. Tevî wan diwariyên ku di jiyana min da derbas bûne, ez bi jiyana xwe razî bûme û min xwe neda ye paş. Ji lewra min her gav xwestiye, di bin barê wê da, bi xurtî ser pêyan bim. Jiyan bi ramanên mirovan ve girêdayî ye. Bê şik raman çak jiyanê çak dike û herçî ramana kirêt jiyanê kirêt dike. Di qadê de ev herdu raman durvê jiyanê serrast dikin.

P - Em dibêjin mîr Celadet Bedirxan, Osman Sebrî, Cegerxwîn.. Hûn cihê xwe di kuda de dibînin?

B - Hûn vê yekê dibêjin, lê herçî ez dibêjim: Celadet.. Celadet.. Celadet..

P - Ji rengan, hûn ji kîjan rengî hez dikin?

B - Hemû reng li ber dilê min şêrîn in, lê pirtir ji rengên ala Kurdan hez dikim.

P - Navê herî şêrîn li ber dilê we?

B - Ji navan, Kewê li ber dilê min şêrîn e.

P - Gotina we ji bo xort û keçên kurdan, çiye?

B - Ez di wê hêvîdariyê da me ku, xort û keçên me bi çand û zimanê xwe mijûl bibin. Zimanê xwe bidin xwendin û nivîsandin. Ji ber ku pêwîstiyên bingehî li ser milên xort û keçên kurdan in.

Kurdên me di dozê da, çima ew şaşin?
Tevger û xebata wan tevde li paşin
Guh nadin dora xwe, di xwe de ew manin
Sed sala bîstan e, kurd têde pê parin
Sed heyf û mixabin ko pîrî da ser min
Ciwani me tev bi derdên te bûrandin
Rojek me dê va tê, kurd têde azadin
Ne xewn e ev bê şik, ji bo wê hişyar bin.

Osman Sebrî

Jêder: Kovara (Roj), hejmara 11'an, sala 1999'an, Qamişlo.

Gotinek û hin nivîs û helbestên Apo

Ev çend helbest û nivîsên Osman Sebrî yê nû, di rêka nivîskar Qado Şêrîn re gihane destê min. Wî jî, ji Ehmed Îcê wergirtibûn, dema ku bi hev re di kovara (Roj) de kar dikirin..

Li gor ku Siyamend Îbrahîm ji min re got: (Min ev nivîs û helbest, di sala 1993'an de ji erîşvê Apo Osman Sebrî girtine û dane Ehmed Îcê da ku di kovara Roj de belav bike..).

Min jî ev çend helbest û nivîsên Apo Osman Sebrî yê ku ji mamoste Qado Şêrîn gihane destê min, wek ku hene, ez ji xwedeveanan re radixînim ber çavan. Hem jî wek nimûne, min kopîya çendikan ji wan yê ku Apo Osman bi destê xwe li dektîlo dane ji xwedeveanan re pêşkêş dikim.

Konê Reş, Qamişlo, 20.11.2012

Ma gelo, îro di me Kurdmancan da Zimanzan Hene?*

Em Kurdmanc hemî di warê ziman da nezan û bi şûndane. Îro em nikarin li ser kesekî kurdmanc bêjin ku zimanzane. Ji ber ku zaravayê Kurdmancî nehatiye civandin û di dibistanan da nedane xwendin û ji hev pij û belav bûye. Di warê wendabûna ziman da gotinek Celadet Bedirxan hebû digot:

(Zimanê Kurdî her wekî texerekî kayê, di nîveka deryayê da valakî, pêlên avê her libeke kayê bi alîkî da dibin. Karê me nivîsevanên Kurd ew e ku, em wan libên kayê bicivînin û vegeînin texer).

Çi mîsalek baş û di cihê xwe da ye. Zimanê Kurdî li ser dirêjîya babelîskan di navber 1200 eşîr da belav bûye. Ji ber ku pê xwendin û nivîsandin nebûye, çar zaravên xweser jê çar bûne, ku xelkê zaravayekî di zaravayê din nagehên.

Li ser rêya beg û axan, şêx û melan ku pêşîya gel bûn, bêjeyên erebî, farisî û tirkî di ziman da cih girtin û bêjeyên kurdî ji ziman hatin bi dûrxistin. Her eşîrekê hin bêje di nav da mane ku kêman caran tên peyvîn. Ev bêje, carna li ser zarê kalan û pîrejinên gundî di nav peyvê da diborin. Kesin jîr û serwest hebin û têkiliya wan bi gundiyan ra hebe dikarin wan bêjeyan binivîsin.

Heke hinek ji me berî demekê bi ziman mijûl bûne, çêtirî ên mayî tiştin zanîne, ew zanîn jî gelekî teng û

hindike, nabe dermanê tişteki hêja û durust. Divê ev celeb kes bi cavê zimanzanan li xwe nenihêrin û sînorê zanîna xwe binasin, an na xwe berradayî navno û bêmiressê dikin. Yek ji van kesan ez im, ku heya îro ji şagirtên ku dersê didim wan hîni bêjeyên Kurdmancî ên nebihîstî dibim. Bawerim ku pirrtirî 2000 bêje di zaravayê me Kurdmancî da hê ez nizanim, ku 2000 bêje dikare bibe zimanekî xweser. Ev e zanîna me ya îro di zaravayê Kurdmancî da, çi zanînek tewş..

Bextiyariyek mezine ku îro em dibînin birrek xortên kurd ên gelparêz fedrasyonê komelên Kurdistanê li Swêd anîne pê û dixwazin ji bo pêşveçûna ziman bixebitin. Ev yeka han, bi qasî ku serê her kurdekî bîrewer bilind dike, dilê kalekî wek min jî xweş dike. Tiştê ku îro ji van camêrên han tete xwestin ev e ku: Bi doz û ramanên siyasî ji hev bi dûr nekevin û dev ji xebata ziman bernedin. Divê ew qenq bizanin ku ji xebata ziman çakir, mezintir û bilindtir nikarin ji bo gelê xwe û serbilindiya wî xebatê bikin.

Dawî, çi gava ku neyarên me dîtine ku hin kurd ji bo xebateke welatî kar bûne, wê kurdekî an hin kurdên bêbav têxin rex wan xebatkaran, çi gava bixwazin, wê xebatê bi destê wan nokeran di hevda diêxin. Em hêvîkarin ku xortên fedrasyonê ji vê yeka han qenc hişyarbin.

5 - 8 - 1982

Osman Sebrî

De peşîrê di de kurdistanê de li swêdê de*

Ev gotarê gotarê Apo Osman Sebrî di sala 1982'an de ji Fedrasyona komelên Kurdistanê re a ku li Swêdê ye, nivîsandiye û ji wan re şandiye.

Li ser vê gotarê Apo Osman Sebrî di sala 1982'an de ji Fedrasyona komelên Kurdistanê re a ku li Swêdê ye, nivîsandiye û ji wan re şandiye.

Ev gotarê gotarê Apo Osman Sebrî di sala 1982'an de ji Fedrasyona komelên Kurdistanê re a ku li Swêdê ye, nivîsandiye û ji wan re şandiye.

Li ser vê gotarê Apo Osman Sebrî di sala 1982'an de ji Fedrasyona komelên Kurdistanê re a ku li Swêdê ye, nivîsandiye û ji wan re şandiye.

Ev gotarê gotarê Apo Osman Sebrî di sala 1982'an de ji Fedrasyona komelên Kurdistanê re a ku li Swêdê ye, nivîsandiye û ji wan re şandiye.

5. 1982

* - Ev gotar Apo Osman Sebrî di sala 1982'an de ji Fedrasyona komelên Kurdistanê re a ku li Swêdê ye, nivîsandiye û ji wan re şandiye.

ZIMAN*

Ziman ew tişte ku mirovan ji dehban cuda dike, hildide warekî bilind û ronak. Mirovan her dem û gavê bi ziman kiriye kam û daxwazên xwe bide xuya kirin û bi zanîn.. û hişyarî bigihê armacên xwe. Gelên serwext û hişyar ji roja xwe nasîne digel zimanê xwe bendewar bûne û goreyî demên ku têda, ziman pêşva birine û ji bo pêşvebirina wî jî, tu fedakariyan bi şûnda nemane. Herçî gelên ku wekî me kurdan bi zimanê xwe ra bendewar nebûne, mane li dawiya koça jînê û nikaribûne ji xwe ra di nava gelên cîhanê da rûmet û giraniyekê çar ikin.

Ma gelo em dikarin ûştta bendewar, nebûna kurdan di gel zimanê xwe li vir bi awakî durust bidin ber çavan?

Bawerim ku ev yeka han zor dijware û ji me nayê. Lê çawa bêjeyên biyanî di zimanê kurdî da cih girtin û bêjeyên kurdî ji ziman hatin bi dûrxistin, ev yek ji ber çavên kesî nayête veşartin. Ev kira bê vac bi destê beg û axan û şêx û melan çê bûye. Ango bi destê kesên ku bi navê kurdan digel milletên serdestî wan ra didan û distandin çê bûye. Ev kesên han, heke bixwazin xwe ji vî gunehê han bişon jî nikarin.

Zimanê kurdî ji ber ku pê nivîsandin nebûye, jê çend zarava çar bûne, ku her zaravayek ji van bûye

zimanekî xweser. Wek: Kurdmancî, Zazayî, Soranî, Fîlî an Bextyarî.

Xelkên her yekî ji van zaravan tişteki ji zaravayên mayî nizanin. Ji van her çar zaravan ê firehtir kurdmancî ye, ku nîzîkî nivê kurdan pê dipeyivin. Lê mixabin ku ev zarava ne gihaye warê xwendin û nivîsandinê.

Çiqas ku ji heftê salî û vir da li Ermînya tête xwendin û nivîsandin jî, bi tu awayî ji warê zimanê folklorî derbas nebûye. Ew kesên ku hîmê ziman ji kurdên Sovyatistanê ra danî bûn, hin Ermenî yên ku li Kurdistanê mezin bûbûn, her wekî divyabû bi kurdmancî nedizanîn. Ji her çar zaravayên kurdî tenê Soranî hinekî pêşve çûye, lê ji bextê kambax ne zaravayê pîrraniya kurdane.

Heke kurd bixwazin di hemî warên jînê da xwe bigehînin gelên aza û pêşverû, berî her tiştî divê digel zimanê xwe bendewar bibin. Çawan mirovekî lalnikare kam û daxwaza xwe ji kesî ra bide nasîn, gelê ji zimanê xwe ra bigane maye, di nav koma gelan da wek wî kesê lal e, nikare heyîna xwe bide xuya kirin.

Kijan kurd ji me bixwaze ji bo serxwebûn, pêşveçûn û serbilindiya gelê xwe xebatê bike, berî her tiştî divê serwextî zimanê xwe bibe û di wî warî da gavine fireh û durust rane. Ne wek camêrên ku di navbera çl- pêncî salî di qada xebata welêt da rawestîn û dawî serpêhatiyên xwe bi tirkî nivîsîn! Ji ber ku her wekî divya bû hînî zimanê bav û kalên

xwe ne bûbûn.. dikarim bi dilekî rehet û bê perwa bibêjim ku; kîjan kurdê têkeve qada xebata welêt û digel zimanê xwe bendewar nebe, ew ne gelparêze, ne dûre ku gelfiroş be jî..

* - Ev gotarê li dor zimanê kurdî, Apo Osman Sebrî di sala 1982'an de nivîsandiye.

Institut kurde de Paris

Nameyek Osman Sebrî ji Profesor Qenatê Kurdo re*

Şam: 15 - 3 - 1985

Mamosta yê gewre profesur Qenatê Kurdo

Ev bû nêzîka du mehan ku dixwazim vê nameyê ji we re bişînim. Lê kesekî digel bişînim rast nehat. Herçî name, kovar û rijnameyên ku li ser rêya postê diçin û tên kêncaran digehên destên me hinek kesan. Li vir reşa me hinekan holê ye, ji bêçareyî em qîma xwe pê tînin. Ferhenga Kurdî- Rûsî û rêzimana ku we di nîveka sala 1983'an da digel keçeka kurd ji bo min şandî di dawiya sala 1984'an da gîhabûn destê min, ango piştî sal û nîvekê. Çîroka derenghatina herdu pirtûkan dirêje, naxwazim serê we biêşînim.


Gelek sipaskarim ku hûn kalekî wekî min jibîr nakin, mala we ava.

Bi dilkulî min nûçeya nexweşiya we bihîst û gelekî ez kizbûm. Hêvîdarim ku salên mayî ji umrê xwe bi xweşî û bê west biborînî, da bikarî di warê ziman da xebatine hêja bikî. Vaye ez jî gîham koça jînê ya paşîn. Ji ber ku rêya xebata zimên heya niha li ber me hatibû dadan, me nedikarî nêzî gel û zimanê xwe bîn. Îro jî nema serê min di warên raman û nivîsandinê da, ji min ra dibe alîkar. Ew serê ku di nava pêçî û du salan da hejde caran ketiye zindanên

turk, fransîz û ereb, yekcar westyaye, nema bi kêrî raman û nivîsandinê tê. Em kurd bûn goriya şaşiyên bav û kalên xwe. Zor mixabin ku ji bo hişyarkirina gel me nikarî gavine fireh rane. Ji ber vê yekê bi destên vala û dilekî xemgîn dê biçim gorê.

Ji bo we her xweşî û serfiraziyê dixwazim. Digel silav û rûmetgirîya min.

Osman Sebrî
Îmza Apo



*- Ev wêneyê nameya Apo ye ji Qenatê Kurdo re.

AI

Min divê tu her bilin bî
Ala rengîn kesk û zer
Him xweşî him ceng û rûmet
Tên zanîn ji sor û gewr

Dûr nêzîk ezê te hildim
Tu î xemla banê min
Ger bivê derman mirin bî
Bo te gorî canê min

Sê salan bi te kêfxweş bûm
Agrî, Zîlan, Tendûrek
Li pêş suhna te bûne ax
Leşkerên tirk lek bi lek

Dêrsim û Sasûn û Pijder
Bo te xwînê dirêjin
Herçî xort in herçî kurd in
Bo te lawjan dibêjin

Leşker im bo te ala min
Min divê gurmîn û şer
Duwanzde milyon bûne pandî
Bo te kurdên pir huner.

*- Ev helbesta Apo Osman Sebrî di pirtûka Dr. Kamîran Bedirxan ya bi navê (Xwendîna Kurdî) de hatiye weşandin/ 1938.

FELEKA BÊBEXT*

Feleka bêbext şikand darê min
Nema kes rûnştî li ber arê min

Ji du hezar salan heya bi îro
Azadî nema di nav warê min

Zarokên bêbav bi find û xapan
Ji berhev xistin dost û yarê min

Qenc û çakên min tev dane kuştin
Qelandin riça karguzarê min

Serek û rêber di welêt neman
Li erdê hiştin koç û barê min

Ji hev perçe bû Kurdistanê gewr
Ket nav destê çar neyarê min

Kirîne guneh bi kurdî peyvîn
Wan divê rakin; ziman zarê min

Dewlemendê min hate şelandin
Ji welêt derket tev zîvarê min

Ew kesên ku xwe mezin dinasîn
Roja teng nebûn bendewarê min

Çend heb ji wana; mabûn di meydan
Îro tev revîn ji ber barê min

Hinek ji wana bê şerm û fihêt
Bi destê neyar bûn sîmsarê min

Dixwazim îro bi hîzebûnî
Bi derxin kurdan ji ber karê min

Qirak, tot û kund ketin warê min
Koleyên kolî kolîdarê min...

*- Ev perçake ji helbestek Osman Sebrî bi navê
(Feleka Bêbext), ji kovara (PÊŞENG), hejmara 5'an
sala 1984'an hatiye girtin.

NIŞTIMANIM

Ev bûn hezar sal ku jana zirav
Wê jana kambax, kirêt û bêbav
Bi dilekî reş, sînga te hingavt
Ji te peritand, wê cerg û hinav

Tu bû pelîse, di destên qirêj
Bûyî çar kerî parve bû ji mêj
Ji be ku pîsan lîwana te girt
Heya bi îro hişyar nebûn hêj

Tu bûye zergûn ji ber hejarî
Her roj li ser te sitem dibarî
Axa te ya çak tev zîv û zêre
Kurd mane bêtaw ji ber zîvarî

Tu wek çivîka ketî devê mar
Kesên di nav te dikin zarezar
Cîhan dibîne vê rewşa dilsoj
Ji bo te nabit kesek bendewar

Hinek kurên te ji dilekî pak
Dikin ji xurtan pîrr hêviyên çak
Ew bawer dikin ku bi destê wan

Rojekê bighên sibeke ronak
Lê heyf tên xapîn xortên xwendevan
Naxwazin bo te biborin di can
Bi raman ketin nav destên xelkê
Holê nikarin azakin kurdan

Divên rêya xwe ji xelkê hînbin
Li ser rêya wan bi nav û şînbîn
Di ber siya wan bêtirs bimeşin
Bê west û mirin xudan zemîbin

Ev celeb mirov gelek bêkêrin
Yekcarî qelsok her çav li jêrin
Nikarin tu car ew bibin piştîmêr
Wek rovî wan çav li destê şêrin

Şêr çi dikare? Ku tu nebî şêr
Zikê xwey birçî duqat nekî têr
Tenê şêr karin kesên qels bixwin
Derrevin li pêş mêrxasên camêr

Nizam çi gavê vê felsefa han
Têxin serê xwe xortên me kurdan
Nebin pelîse di destên xurtan
Di nav te bibin bi rûmet û şan

Ez her sond dixwim bi zinarên te
Tu car xwe nadim rex neyarên te
Heya ku xweş bim serbilind bijîm

Piştîmêrî bikim bo zîvarên te

Bijî her bijî niştimanê min
Ji bo te gorî mal û canê min
Dê bibin pandî ji bo axa te
Piştî dîmirin sê lawanê min.

9 - 7 - 958

Osman Sebrî

Institut kurde de Paris

GELÊ BÊ SERÎ

Ho gelê bê serî, sergevaz û serdar
Ji vê xewa kambax tu nema dibî hişyar
Îro dengê min dernakeve ji fihêti
Di warê jîna te dibînim pirr kirêti
Pîsî, xinizî, bêbavî dibin gelek
Nebî dîsa sûcê xwe têxî derê felek
Ji mêjva te dev ji rêya rûmetê berda
Bûyî bêra gemarê di destê nemerda
Bi te qirêja derê neyaran rêj dikin
Di rêya berberiyê te şaş û gêj dikin
Bizan, dema bo birayê xwe dibî berber
Bêhemdî ji neyarên xwe ra dibî noker
Kesê bi rûmet kêmiya han nehewîne
Çavên xwe veke ho, serê xwe hilîne
Çarmedorî te hemî gel bûn serxwe, aza
Tu tenê maye qels, bindest, zîvar û weza..
Ma ev qelsî û bindestî te naêşîne?
Mirovê camêr wek te bîgane namîne
Divê ji gunehên kevn û nuh tev şiyar bî
Ji bo têkoşîneke xurt û çak li kar bî
Nebî xwe dispêrî zarokên beg û axan
Ew her noker bûn, dê noker bin hemî çaxan
Şêx û mela tu caran jî wan ne çaktirin
Kavilê berxan wergirtine, lê ew gur in
Tevan ne dixwest û naxwazin tu hişyar bî

Bo doza serxwebûnê pêkhatî li kar bî
Bê xem tu nivistî di himbêza van kesan
Lewra ketî bin lingên neyar û nakesan
Ka, havila têkoşîna şêst-heftê salî?
Hê bindestî, diêşî, dikizî, dinalî..
Her carê bi renekî hatin te, tu dotin
Lê pêş çavên te şûreşa serdest firotin
Ewin, hefsarê kolîdar xistî serê te
Ewan ji rêya rûmetê badan berê te
Hê.. heya çî gavê tu yê li pê wan doş bî?
Wekî beg û axa dixwazin xwefiroş bî.

2 -

Heke te divê dengê te hebe li cîhan
Bî serfirazî bijî di nav Kurdistan
Bilez, divê zûka ji wan dûrkevî
An na, tu yê di pirr kortalên kûr kevî
Ji wan kortalan derketin gelek dijware
Kesê rêya xwe ne nase tu car nikare
Ma dem nehat ku tu rêya xwe binasî?
Ji bejna xwe bişeqitînî wî kirasî
Kirasê nezanî, qelsî, bêmirêsiyê
Li ser navê xwe yê çak rakî wê pîsiyê.

1 - 11- 979

Osman Sebrî

HO ŞIVAN

Ho Şivan, şivanê Kurd, kurdê şivan!
Li pêş te ez dibînim dozek giran
Dozek bi ser û ber, bê dest û pê
Li pêş me hatin dadan dergeh û rê
Serê me bû berîka kesên hişyar
Çi xwestin ew xistinê, hemî xisar
Di warê serxwebûnê me ne bû kam
Holê em nizim ketin bûne xulam
Pirrtirî du hezar sal em bindestin
Her carê me tiliya xwe digestin
Nexurand bi destê xwe me pişta xwe
Di warên xelkê dikir me geşta xwe
Warê me dibû kofî ji bo biyan
Li ser me hikim dikir xwedî raman
Niştiman wa xopan bû gel tê bindest
Bi destên xêrnexwazên kevneperest
Ezmanê Kurdistanê reş û tarî
Bi ser da sitemek xurt her dibarî
Gel têde bindest maye şewişîye
Wek colê serberdayî bê xwedîye
Neyarên me ne yekin, sisê û çar
Dirêjî me dikin ew wek gurên har
Her rojê kuştin, mirin, nefî, zindan
Şêst salin pêda eve halê kurdan

Peyayên qenc û sere têne kuştin
Kesê jê arudû bê qet nehiştin
Bi destên neyaran tên vegijgijîn
Bê taw man nema zanin çawan bijîn
Direvin, belav dibin di cîhanê
Nizanim bo kê dihêlin Kurdistanê
Niştiman perçe bûye çar kerî ne
Kesên tê kal û ciwan tev serî ne
Serîne bê dest û pê, bê ronahî
Ji lewra di welêt da nema şahî
Xortên me ji kalên xwe ne çêtirin
Zana ne ji nezanan bê kêrtirin
Naxwazin bi zanîna xwe aza bin
Dixwazin wek tê xwestin ew pê rabin
Berên wan ketiye hev bi neyarî
Şerpeze westiyane di vî warî
Ma kînga bi yek destî ew dê rabin?
Bi xebat û ramana xwe aza bin
Pirrên wan wekî axan difikirin
Di rêya xelkê da ew her dimirin
Her wekî Xwedê dane ku xulam bin
Ji bona gel û welat ew bê kam bin
Naxwazin bi destê xwe ew bên vejîn
Dixwazin di ber destên xelkê bijîn.

* * *

Plîstî ez bêhêvî bûm ji van kesan
Ku welat nê parastin bi hewesan
Vegerîm min berî da we mendalan
Bawerim hûn ne wekî xort û kalan

Dê ji bo rizgariyê bixebitin
Bikarin li pêş neyar bitewitin
Bi serê xwe biramin, ne ên biyan
Holê dê bikaribin hemî kurdan
Li Îraq û Îranê, li nav Turkan
Vejiîn, yekdest bikin wekî burkan
Biteqin di çar cihan wek hîdrojiîn
Biheze di bin we da rûyê zemîn
Çarmedor neyaran tev birevînin
Rêzanek pêşverû di welêt dînin
Xelas bin ji bin destê van zorbazan
Welatê xwe paqijkin ji tolazan
Serbilind aza bijîin di niştiman
Wê hingê serxwe dinin di Kurdistan.

1 - Kargehan 1983
Osman Sebrî

ŞÊRÊ MIN

Mihemed Xêr, Mihemed Şêr
Bi kêr hatî gelek camêr
Dixwazim te bibînim ez
Welatparêz ramangelêr

Bi kêrhatî bo niştiman
Şiyarkî lawê kurdan
Berê wan bidî xebatê
Azakin Kurd û Kurdistan

Aza bi ramanek xweser
Xortên hêja bibin rêber
Tevayî dest û pêyên gel
Pêşengê wan bibe serwer

Berî vê ne şiyarbûn em
Ji me çûn gelek keys û dem
Îro jî ne şiyarin hêj
Digel dijmin dibin hemdem

Ji mêjva dijminê bêbav
Lî pêş me danîbûn pirr dav
Naxwazin qenciya Kurdan
Nahêlin jê vebe yek çav

Tevî vê em xwe dispêrin

Neyaran, bê ku binhêrin
Li şopa wan a malkambax
Dibêjin ev çî camêrin

Nikarin gel bikin hişyar
Xortên ku hatine ser kar
Berên wan ketiye hevdu
Di nava wan nînin serdar

Bê serdar nebû tu caran
Ku kes xwe bighîne waran
Dawî dê vezelin bê taw
Di himbêza sitemkaran

Bi hêvî me tu serdar bî
Ji rewşa gel çak hişyar bî
Nehêlin ew bibin pîrbend
Ji bo azadiyê kar bî

Azadî peşka mêran e
Sergermî karê şêran e
Serhişkî doza bêheşan
Serdestî her bi YEZDAN e

Mihemed Xêr, Mihemed Şêr
Bi kêr hatî gelek camêr
Dixwazim te bibînim ez
Welatparêz ramangelêr.
Apo, 6 - 11- 983

XEWNEROJ

Nene, Kewê çûn seyranê
Digel hin nas û cîran
Kalo tenê ma li mal
Bê hogir û bê heval
Rabû balgih hilanî
Li ser nivînê danî
Serê xwe da ser nivist
Dest û pê lê bûne sist
Nedît çawa kete xew
Xewnek şêrîn û bedew
Dengê zengil hate wî
Bi lez diçû ber derî
Derî vekir hêre kir
Li rûyê wan mêze kir
Hîvron, Nermîn û Lewend
Hingûr tevî Siyamend
Li plîst derî tev rûgeş
Xesma Hîvron a keleş
Berçavik hildane jor
Dipeyive çarmedor
Dibêje: Çûme Berlîn
Tevî xalê xwe Hoşîn
Ez çûme rûyê Lewend
Min himbêz kir Siyamend

Berî keçan ramîsim
Gotina wan bibhîsim
Ez teker bûm ketim xar
Ji xewê bûme hişyar.

Kalo

12 - 7- 1983

Rûpelek ji Nivişta Jiyana Min*

Zêdetir ev bûye sîh sal Ku bi derdên te mijûlim, bûm
penaber.. Vê yekê ez xweş dizanim.. Îro bûme kal,
kopal di dest da, pişt nixûm im..

Her wiha, min ciwanî tev bi derdên te bûrandin.. Kî
dizane, ku li ber gorê me..? Lê, ta bi vir jî, di dozê
da can dida min..

* Ev gotinên Apo Osman ji Ehmed Icê gihandine
min.

MENEWS

Min navê wê pirsî Menews
Bi saw û suhn dihat bi meş
Berdane min du çavên reş
Aqil ji min kir tewş û mewş

Ji suhna wê ez tertilîm
Ji hel ketim zû bertilîm
Li ser rêya xwe şerpiîm
Bbo nihêrîna wî rûyê geş

Fêrişte bû hat ji buhişt
Wek lehiyê pêş xwe dimişt
Bi awiran her xelk di kuşt
Lê kuştinek şîrîn û xweş

Bejna zirav, dêmên gulîn
Cerg û hinav tev kir birîn
Şêlandim ez ji şîn û vîn
Wek jandiyê ji mêj nexweş

Gerden zirav qefsîng bilind
Memik li ser bûbûne tund
Dihejiyan wek gûzên Hind
Ez şêt kirin hîştim bêheş

Bi lez û bez dilebitîm
Çîçkî di xwe dixebitîm
Wek xortekî ez tewitîm
Got min: Apo roja te xweş

Heywax û sed hawar ji dil
Kalbûn ji bo min bûye kul
Ji min şikandin dest û mil
Kambaxiya ev bextê reş

Min gotê: Ho keça çeleng
Ger tu zerî û şûx û şeng
Kalan hene pirr nav û deng
Pê distînin keçên keleş

Bersiv dida min wê gavê
Got: Nakevim ez vê davê
Min nav û dengê we navê
Xort be bila koley Hebeş.

Suweyda: 25 - 10 - 1967

Osman Sebrî

INSTITUT KURDE DE PARIS
Bibliothèque

MER-HOV

Mîna navê wê jîra! Merhov ji nav u wêna dîkt bi we
 Berdava min ku çavê reş Agil ji min fir tev, u neq.
 Ji sêna wê ez tevlîkî ji hat ketin dî berîlîk
 Li ser rûya xwe çêpîlîk Be nêzîka wî rûgê çê.
 Fêrîgê bû hat ji bîrîkî ew lêhîgê jê xwe dîmîk
 Bi wîzên her wîk dîxatê jê xêzîka jîlîkê xwe,
 Nejen xîraw herêkê çîlîk Çêq u hînav tev kir dîk
 Çînanîkê ez ji jîn u wîk xê jînanîgê ji wî neqev,
 Gerdên xîraw xîrawê çîlîkê berîk li her lêgîkê xêk
 Dîherîyan wê jîlîkê dîkê li çî kîrîkê çîlîkê xêk,
 Bi tes u wêk dîherîkîkê Çîgêlê di xê çînanîkîk
 Xêk xîrîkê ev tevlîkîkê Got xîk: "Ayo xîkê te xêk,
 Herwan u wêk hawê ji dîlîkê jî ku min xîkê xêk
 Ji min çînanîkê xêk u wîk çînanîkê ev xêkê re,
 Min jîlîkê: "Dîkê çînanîkê Got li serî u çîk u çêk
 Kêlîkê xêk jîrê nav u çêkê jê çînanîkê çêkê çêkê
 Herêkê xêkê min u çêkê Got: "Xêkêkê ev wê çêkê
 Xîkê nav u çêkê ev çêkê Xêkê te bîlîkê çêkê çêkê."

Merhov, 1910-1967
 Usman Sebrî

MER-HOV

Di warê jînê bi vî navî hatî navandin
 Di serê te da gelek pîsî hatine çandin
 Destê felekê berê te da herçiya neqenc
 Kuştin û talan, xuddînî, kambaxî û sed renc
 Ji bo çakî û qenciye her dij û neyarî
 Ji bona kam û daxwaza xwe wek gurê harî
 Qelsên xwe dixî bindestiyê bê dilovanî
 Bi zir û fortan tu diçiyê, ew bi nezanî
 Xwe dispêre ser siya te, lê tu ne qencî
 Bê bext û dilreş, çav li xwînê, her xwedî rencî
 Rûmet ji xwe ra te kir mertal, lê qet nenasî
 Her gav veşartin pîsîyên xwe di vî kirasî
 Bê ûşt dikarî bi hezaran kesan bikujî
 Xwîna rebenan, belengazan bê tirs bimijî

Devê xwe pakî, bêjî xelkê: Ez dilovanim
 Xêrxwazê welat, piştîmêrê gel, qencê cîhanim
 Mafir te evin rwwş û tevger tu her kirêtî
 Çakî te nîne, dongî reşî, çepel û şêtî
 Divê gelekî fihêt bikî ku tu mirovî
 Çav li sitemê, zirt û xapan, bûvac û hovî.
 23 - 9 - 1983

O. S.

NEWROZ

Di wêrê jîrê bi wî wêrê hatî navandin .
 Di wêrê te me gelekê efîş hatine çarîn .
 Dostê telekê bîrê te ku herçîyê çarîn .
 Iştîq û talan, zûbînê, kumantî û wêrê çarîn .
 Ji me çakî û qencîyê her çîy û wêrê çarîn .
 Ji her çîy û herçîyê her çîy û wêrê çarîn .
 Çêrê her çîyê bîstîyê her çîyê çarîn .
 An wêrê te çarîn te çêrê her çîyê çarîn .
 Her çîyê çarîn te, li ku her çîyê çarîn .
 Dîwan û çêrê çarîn li wêrê her çîyê çarîn .
 Xêrê ji her çîyê te çêrê çarîn, li çêrê çarîn .
 Her çîyê çarîn çêrê her çîyê çarîn .
 Ji çêrê çarîn te her çîyê çarîn .
 Xêrê çarîn, bîstîyê her çîyê çarîn .
 Dostê her çîyê, çêrê çarîn : çêrê çarîn .
 Her çîyê çarîn, çêrê çarîn çêrê çarîn .
 Her çîyê çarîn çêrê çarîn çêrê çarîn .
 Her çîyê çarîn çêrê çarîn çêrê çarîn .
 Her çîyê çarîn çêrê çarîn çêrê çarîn .
 Çav li çêrê çarîn çêrê çarîn çêrê çarîn .
 23 - 9 - 1983
 O. S.

NEWROZ

Newroz pîroz li niştîman
 Dihewînim ji dil û can
 Ew sersala gelê Kurd e
 Divejînim li Kurdistan.

21 - 1 - 1982

O. S.

BIHAR

Gava dinê dibe bihar,
dibişkivin devî û dar.

Zozan têne guharrtin zû,
mîna cilên bûkên di nû.

Nêrgiz, sosin, kulîlk û gul,
dîrevînin xeman ji dil.

Dinya dibe wek gola şîn,
çiçek didin sed rengî bîn.

Xasma sibana berbangê zû,
tev radibin ew teyr û tû.

Vêk ra dîkin şahî û saz,
hişyar dibin hulîlk û baz.

Bilbil dibe dengbêjê wan,
dikit qîrîn ji dil û can.

Pîroz dîkin rojên di hev,
hîn xweştir e biharê şev.

DIBISTAN

Destpêk bi navê Yezdan,
ev e diçim dibistan.

Divê êdî bixwînim,
bo rastiye bibînim.

Da her tiştî bizanim,
heya ku pê bikanim.

Berî vêya gelê min,
nezan mabûn mêr û jin.

Daketibûn hêla jêr,
reben pepûk û bêkêr.

Lê ji îro bi şûn da,
di nav bajar û gunda,

Herçî kurd e wê bixwîn,
da ku bibe xweyî şîn.

Welatê xwe bistîne,
neyaran jê derîne.

Em in xweyî war û şûn,
doza me ye serxwebûn.

Ji bo me ye hêla jor,
hildin ala kesk û sor.

Serxwe nabe Kurdistan,
bê xwendin û dibistan.

Osman Sebrî

Institut kurde de Paris

GURÊ PÎR

Dibên li nav Xidirsor,
di binhêla Kawê jor,

Gurek bûbû pîr û jar.
Pê nedibûn raw û kar.

Dît gurekî pişt hêşîn,
şeng û oflaz û narîn.

Piştî hal û xatiran,
şor kirin her du guran.

Yê pîr digot: Birazî!
Tu mêrekî xêrxwaz î.

Rawekê bo me daxî,
sifra xwe li vir raxî.

Ser û peyan bi xêr kî,
zikê mamê xwe têr kî.

Tezîk da xwe gurê şîn,
gotê: Mamê dûrebîn!

Tu kalekî dilçak î,
malbata min nas nakî.

Ger zanibî warê me,
keleşiya karê me.

Em rêbirr û mêrkuj in,
xwîna neyar dimijin.

Fermû were li pê min,
dê zanibî carek din

şelpên gurê pişt hêşîn,
bi çavên xwe tu bibîn.

Rabûn her du bi rê bûn,
rêya bajêr girtin çûn.

Yê pîr bawer ne dibû,
lê ji şerman li pê çû.

Rast ajot nav dewaran.
Peya hatinê bi daran.

Yê pişt hêşîn direvîn,
giş li yê pîr dicivîn.

Gihîştinê di pa ra,
lê xistin ji xwe û xwe ra.

Bi zora lingan reviya,
xwe avêt nav deviya.

Dema birîn dibûn sar,
dest û ling jê bûne dar.

Welê mabû nîvmirî,
dil jê xav bû bihirî.

Rastî wî hat gurê zer,
hilmiştî û dîlawer.

Li gurê pîr silav kir,
jê pirsî hal û xatir.

Yê pîr çîrok jê ra got,
dil û kezab ji xwe sot.

Derdê gurê pişt hêşîn
hemî jê ra da zanîn.

Wî got: Mamê bextereş
Ma te nîn in eqil û heş

Çawan gurê pişt hêşîn

Yên wekî te dixapîn?!

Ger te divê bibî têr
li tevdîra min binêr.

Ev e kalek diçe êş,
Kurrî maye, ker li pêş

Tu kurriyê birevîn,
hemî kal ê te bibîn.

Dema ew bê ji bo wê,
dê ji ber kim ûrê dê.

Gava bibîn vê derê
wê veqerre ser kerê.

Heya ew xwe bighîn ser,
dê biçin kurrî û ker.

Kalo dê bi destê tal,
zû vegere here mal.

Hînga em ê herin ser,
zikên xwe tev bidin ber.

Gurê pîr got: aferîn,
min eciband ev zanîn.

Tevdîr ê cih bibîne,
kal ê bê ker bimîne.

Hûn gurên zer çî şeng in,
her dem bi nav û deng in.

Rast jî bi wê tevdîrê,
her du gur çûn nêçîrê.

Ker û kurrî dikuştin,
bar li erdê dihiştin.

Kalo dikir barebar,
her du guran goşt dixwar.

Gurê pîr zik kir texer,
bi tevdîra gurê zer.

BERSIVA HOŞENG

Hoşeng!

Roniya çavê min,
Pandiyê navê min,
Hêviya min a pêşîn,
Di nav pêrêyên jîn,

Divêm çend peyvan li gel te bikim.
Bê qirên û deng Nizanim wa ji te dipirsim;
Ka te tişteke nasiye
Wek kesên bîrbir,
Jêhatî, ez nawir,
Ji êşa welat
Warê xebat
Derd û kulên min.
Nabêjim tu ne jîr î,
Ne dibêjim tu dibîrî.
Tenê sergermiya te,
Tu rojan,
Tu deman,
Nahêle ku li ci kirê hûr bî,
Û çak bibîrî.
Berî tu hebî,
Piştî tu hatî,
Gelek caran ez ketim nav
Lepên neyaran,

Tevî zor û lêdan,
Digel zirt û fortan,
Di çavên min nedîtin tirs,
Ji devê min negirtin yek pirs.
Te bi çavên xwe dît,
Carekê, du caran,
Ku zor û êşandin pir hebû.
Digel min xwe westandin,
Dawî suhna xwe revandin.
Lê serê min nizm nebû.
Bi ya Xwedê her nizm nabe,
Diviya bû dilê te bi vê yekê şa be.

Tevî van bûyeran,
Li ser gotina tewtewe û qeşmeran,
Jehra ku berdane guhên te,
Bê raman û xweragirtin,
Bi ser min de dirêjî!
Berî vê bi sê salan,
Ji min re dinivîsî, holê dibêjî
"Bavo, dibînim di nivîsarê te
Dibihîzim ji dost û yarên te,
Şopa bêhêviyeke cankuj,
Xwe berdaye ser dilê te,
Pê sist bûne dest û milên te!.."

Delal!
Berî her tiştî,
Ew rewrewok ne dost û yar in,

Birek tewtewe, xêrnexwaz û çavnebar in.

Ji her nasî re dost û yar nayê gotin,

Holê pergela mirov tête sotin,

Ev celeb kes dema rûbarî te bin

Pir nerm û xweş in

Di paşgotiniyê wekî mar in,

Gelek dilreş in.

Naxwazîn kesek paqij bimîne,

Qenciya camêran dilê wan diêşîne.

Ji bo çakan û çakiyê dij û neyar in,

Di devavêtinê de wek segê har in,

Divê bizanî ev celeb kes wek mişkê lûr in,

Wan bînayî nîne, li ser bênê dimeşin.

Ji zikmakî kûr in.

Ma gelo dizanî mişkê çi teba ye? Wek van kesan ji

dîtina rastiyê

Û qencyê dûr û cuda ye.

Lûr li ser rûyê erdê najî, her jêzemîn e.

Tiştên li ser rûyê erdê

Di nav ezmên yekcar nabîne.

Çiya, dar û ber û keskayî,

Çem, co û cobar û ronahî,

Asîman, stêrk, ro û hîv,

Gewher, pilatîn û zêr û zîv,

Tev jê re nas in, li nik wî ne teba ne.

Jê re ne hêjayî kêzikekê û du kurma ne.

Kir, tevger û xebata wî di cihên teng û tarî,

Jê re kurm û kêzik bihatir in ji elmas û mirarî.

Apolo û Kosmos wî bendewar nakin,
 Xwarina çend kêzikan dikarin dilê wî şa kin.
 Ev e rê û ramana van celeb kesan,
 Têgihan û bîrbirina nandoz û teresan.
 Li pêş dost û yaran qurre û çalak in.
 Dema rûbarî neyaran dibin bizdok û perşikestî,
 Nikarin serê xwe rakin.
 Lê ji bo kurdên dilçak û doza welat,
 Bê ûst ji devê wan dertên her agir û pêt.
 Nemaze ji bo kesên têkoper û gelparêz,
 Gunehan çar dikin, didin berhev, dikin rêz.
 Çi kesê ji zanîn û baweriya wan bi dûr keve
 Dibêjin "şaş" e
 Ji kesên wek xwe bizdok û çepel re
 Dibêjin
 "Têghiştî ye, gelekî baş e!"
 Ew ne yên xebatê bûn,
 Temê diketin riya xebatkaran.
 Kama wan di hatina nav
 Xebatê çavnebarî bû,
 Sixwestin ew jî wek camêran
 Bêne xuya kirin.
 Xwehildana wan ne xurtî û fedekarî bû.

Zûka reviyar, dema ji wan ve xuya bû mirin.
 Hinekê wan hatibûn nav xebatê ji aliyê neyar,
 Da ku bera hev din, di berhev bêxin kesên ne hişyar.
 Teqez baweriya wan bi gel nîne,
 Herçî ew bi xwe ji canê xwe bê hêvî ne.

Dijî gelê xwe tu nizanî çî pêxwas in,
Berdestî ne wek tajiyên bi meras in.
Ji bo gel nawestînin ji xwe lingan,
Ji bo xelkê, xwe davêjin ser pilingan,
Ev e rewşa îro di nava gelê meyî nezan,
Lîwana xwe spartine noker, bêbav û xinizan.
Neyê bîra te ku rewşa Kurdên Rohilat û Bakur,
Ji rewşa Kurdên Sûriyê durusttir û çaktir e,
Em hin tiştan ji wan dibihîsin halê wan
Ji ê me pir kambaxtir e!..
Ev e ku nahêle em ber hev bîn û bibin yek,
Bê şerm em gunehên xwe diêxin ber
Derê koledar û felek!:

Delal:

Gava em ne çak û durust bin,
Teqez ew ji pîsî û neqenciya me ye,
Em çawa dikarin bêjin "Sûcê felek
û kolîdar tê heye?"
Ma heya çî gavê em dê ji sûc û gunehên xwe
birevin?
Riya rast berdîn, bikevin xaçerêyen, deverû bikevin.
Riya rast şemirandin ne karê camêran e; teqez qelsî
ye,
Ji gunehên xwe revîn karê namerdan e, bes pîsî ye.
Ji bo çî holê em pîsiyê di xwe de tînin?
Neyar û namerdan dilgeş dikin, bi xwe dikenînin.
Ev yek bûye nexweşiyek malkambax ketiye canê
me.

Nizanim ev çî bextreşî ye ku zanayên me pê ketiye
pirtirîn nezanên me...

Kesin hene ji gunehên xwe direvin,
Alîkî di riya felekê re diêxin derê Yezdan,
Aliyê din, bê şerm û fihêt diêxin derê şeytan.
Xwe ji guneh û kêmasiyan dişon wekî me kurdan.
ku me ji vê guhertiye,
Me kolîdar xistiye şona
şeytan!..

Wey xwelî li serê me, me riya rast şemirand,
Ew bûne pelîse ketine bin lingan..
Gelo! Ma em dê çawa xwe ji vê nexweşiyê xilas kin?
Gunehên xwe bibînin, qencî û neqenciyê ji hev nas
kin?

Kurê min!

Wa tu li Ewrûpa yî, va me li
Rojhilat,
Teqez ne razayî me ji tevgera nav
welat

Çavdarê hemû bûyeran,
Guhdarê nûçe û xeberan,
Dibînim, dibihîsim, dêşim,
Haydar im ji hemî war û deran,
Tu tenê dibihîsî, lê ez dibînim,
Hophopa qeşmeran,
Canxulamiya nokeran,
Dûvlûçandina nandozan,

Devxumxumandina bê dozan,
Demnasiya kêsbazan,
Zimandirêjiya tolazan,
Di nav pêlên gemarî;
Di nav rojên reş û tarî,
Tertilîna gel,
Tevgerên bê vac
û çepel,
Koraniya rêberan,
Bertilîna têkoseran,
Rê li ber wan wenda,
Ji armancê cuda,
Nema dizanin
çi bikin!..
Tev mane bê war,
Nabin hişyar!
Bi tevayî ketine ber lingan
û hembêza neyar.
Hey wax û sed hey wax,
Di nav kulên kambax,
Ku her roj dibînim,
Dêşim û dilbirîn im.
Xwezî min nedîtibûya,
Çê ku tu nabînî,
Teqez tu bextiyar î,
Ne wek min xemgîn î.

Guh bide min, delal!

Ez sond sixwim bi serê te û Hoşîn û Heval,

Ku tu caran ji xwe û gel bê hêvî ne bûme,
Li ser şopa qelsan nehatime û tê neçûme.

Tenê hin karbidestên xêv û nezan,
Totik vala û cendek giran,
Di nav şoreşê,
Li nav niştiman,
Hineka bi serhişkî,
Hineka bi oflazî,
Hineka bi xinizî,
Hineka bi xêrnexwazî
Gelekan jî bi talankerî û dizî,
Kir, tevger û peyvên wan,
Dikarin welat û şoreşê tev têxin bin ligan,
Bê þivîsk, ez gelekî diêşiyam bi van kirên han,
Kesek serwext û bîrbir û hişyar,
Dikarî qenc bibîne
Çak bibîne,
Gelek tiştên ne diyar.
Ji alîkî nezaniya gel û teneghiştina xortan, Ji aliyê
din alozkeriya bêbavan reyin xêrnexwazan.
Me nediviyabû rê bidim devlokiya qeşmer û tolazan.
Ji lew re diviyabû ji her kirê hûr bim
Xwe ragirim, ji her kesî dûr bim.
Heya rastî ji her kesî ve xuyabe,
Qencî û neqencî ji hev cuda be.

.....

.....

.....

Kurê min, niha dê bême ser te,
Dilê xwe vekim li ber te,
Binhêr ev e şîreta min,
Dê bêjim pir kurt û kin:
Ku di hemî kir û waran,
Di gel hemî nas û neyaran,
Baş vekî çavê xwe,
Bîr bînî şîreta bavê xwe,
Lî ser her kir û gotinê hûr bî,
Ji kir û gotinên lêz dûr bî,
Heya nekevî kêmfî û şaşiyê,
Fihêtkar nebî li paşiyê.
Ev e şîreta durust û çak,
Ji bo we xortan dixwazim
Pêsendeyek xweş û ronak.

Osman Sebrî
1977





Konê Reş Kî Ye?

Nivîskar û helbestvanekî Kurd e.. Navê wî Selmanê Osmanê Abdo ye. Sala 1953'an li gundê Doda, nêzîkî Qamişlo çêbûye..

Di malbateke Kurdperwer, zimanhez û rewşenbîr de mezin bûye.. Ji mêj ve hez ziman, folklor û toreya gelê xwe kiriye.. Û wiha gelek berhem û gotarên wî di kovar û rojnameyên Kurdî yê mehane û rojane de hatine weşandin û gelek pirtûkên wî hatine çap kirin.. û bi serketin di her çar perçeyên Kurdistanê de hatiye naskirin..

Konê Reş, yeke ji wan kesên pêşîn yen ku di van sîh salên dawî de li Rojava/ Bînxetê bi zimanê Kurdî nivîsandîye. Hêjî bi kar û barên xwe yê nivîsandina bi zimanê Kurdî berdewame.

Ew hebûna gelê Kurd di hebûna zimanê Kurdî de dibîne û her dem dibêje: Zimanê me dîroka me ye.. Hêvî û daxwazên wî jî evin; ku wê rojê bibîne; ew roja ku her sibeh rojnameyeke Kurdî bi tîpên Latînî li ber deriyê mala wî be û bi rêka wê rojnameyê nûçe û bûyerên Kurdistanî û cîhanî bixwîne.

Ew xwediyê kovara "Gurzek Gul" bû, di gel hevalê xwe A. Baqî Huseynî, ta bi hejmara 11 an, paşê wî bi tena xwe berpirsariya kovarê kir, ta ku hejmarên wê gîhan 15'an. Ew kovara ku di navbera salên 1989 û 1992'an de, li Qamişlo, li nav Kurdên Bînxetê dihat belav kirin.

Ji berhemên Konê Res:

- Serpêhatiyên Mîran (1) Beyrût 1991
- Mîr Celadet Bedirxan, bi Erebî, Şam 1992, bi Kurdî Stokholm, 1997
- Serhildana Sasonê, 1925-1936, Şam 1995, bi zimanê erebî ye.
- Komela Xoybûn û Bûyerên Rojane yên Şoreşa Araratê, Erbil, 2000, bi zimanê erebî ye.
- Dîroka Qamişlo, Lêkolîn bi zimanê erebî ye. Stenbol, 2003, Heleb, 2004 û Silêmaniyê, 2006, Şam, 2012.
- Welato!, Helbest, Beyrût, 1998
- Dergehê Jîn û Evînê: Helbest, Beyrût, 2001
- Cûdî Çiyayê Miradan: Helbest, wergerandina Hejar Îbrahîm, Şam, 2004
- Dara Çinarê, Helbest, wergerandina Îmad Elhesen, Şam 2006
- Şîhîna Şevbuhêrkên Dîl: Helbest, Ji weşanên Yekîtiya Nivîskarên Kurd tayê Duhokê, êlûna 2010.
- Sîpan û Jîn, helbestên zarokan: I. Beyrût, 1993
- Şagirtê Bedirxan im, helbestên zarokan: II. Beyrût, 1996.
- Helbestên zarokan: Amed (Diyarbakir) 2013.
- Dîroka Rojanamegeriya Kurdî li Sûriyê û Libnanê: 1932 - 2012, lêkolînek berfireh e, Duhok 2013.
- Bajarê Cizîra Botan û Hunera Mîr Bedirxan, Stanbol, 2013.
- Ji Geşt û Serdanên Min: siyahetnameya hin gera ye, Qamişlo 2017.

Dawî, ew xwe bi vê helbestê dide naskirin:
Mirovekî Kurd im
Ji sala 1514'an ve
Ta roja îro;
Di kul, êş û janên
Gelê xwe de diponjim
Xemxur û zikêşê
Zimanê dê û bavê xwe me;
Yekim, ji wan kesên ku,
Li dor malbata Bedirxaniyan
Dixepêrim..
Ez Konê Reş im..

Institut kurde de Paris

Institut kurde de Paris

Naverok:

Diyarî.....	3
Pêşgotinek Pêdivî.....	5
Osman Sebrî lehengek ji welatê min e.....	9
Osman Sebrî di salên 1929-1951'an de.....	13
Osman Sebrî di salên 1951-1971'an de.....	33
Osman Sebrî di Salên 1971-1993'an de.....	42
Ji Pirtûkên Osman Sebrî yê çapkirî.....	49
Ji pendên û şîretên Apo Osman.....	55
Ez û Kovan Xankî û helbestvaniya Apo.....	61
Apo û pêşgotina dîwana Cegerxwîn.....	68
Dr. Nûreddîn Zaza û Apo Osman Sebrî.....	72
Hevpeyvînek Ahmed Icê bi Osman Sebrî re.....	74
Gotinek û hin nivîs û helbestên Apo.....	81
Bersiva Hoşeng.....	117

Institut Kurde de Paris

Institut kurde de Paris

Osman Sebrî navekî sereke û belû ye di nav tevgera rizgarîxwaza gelê kurd de li Suriyê û di tevayî Kurdistanê de. Wek; têkoşerekî, torevanekî û rewşenbîrekî hatiye naskirin. Vî lehengî bi tev şîyanên xwe bervedêrî di ber mafê gelê Kurdistanê de kiriye. Gelek caran ji rex dagirkerên Kurdistanê ve hatiye girtin, sirgûnkirin û tev jiyana xwe di mîsaxî û zîvîyan de derbas kiriye. Wek dîdevanekî bû ji şoreşa Şêx Seîdê Pîran re.

Di navbera salên 1926'an û 1971'ê de, anku di navbera (45) salan de (18) caran hatiye girtin û zindankirin. Anku di (88) biharên xwe de, bi vîneke ku nayê tewandin li ber xwe daye û ranewestiya ye. Di sala 1971'ê de, ji nû li mala xwe a li Şamê rûnştiye, xwe durrî karê siyasetê kiriye û dest bi fêrbûna zimanê Kurdî kiriye û ewe yê ku gotiye:

Xwe danînim ber sîtem û zorê
Divê serbilind ez biçim gorê
Gava bi rûmet biçim goristan
Hêjaye bibim lawê Kurdistan.

Konê Reş